Abbas ISMAÎL

# EM BERANÊN BER KÊRÊ NE

Institut kurde de Paris

Çîrok

KL
9

Institut kurde de Paris

LIV. - K.L
4059

# EM BERANÊN BER KÊRÊ NE

INSTITUT KURDE DE PARIS
BIBLIOTHÈQUE 23/11/2017
914 ISM EMB

Institut kurde de Paris

*Mafê çapê parastiye*
- *Çapa yekê- 1000.6.1998*
- *Sûriya -Qamişlo-*
- *Kompiyoter : Azad*

Institut kurde de Paris

# DIYARÎ

*Mamostayê birûmet û hêja Ismaîl Beşikçî digel slavên ji dil û can, min bibûrîn bo vê diyariya hindik, ji lewra ez ne ristevan û helbestvan im, ez srûdan bo pesin û kesîtiya te birêsim .*

*Ez ne stiranvan im qawinekî ji destana Ûsifê Seydo-Şêxê Palo-Şêxê Nehrê – Paşayê Agirî, ji te re bi dengê xwe yê xemgîn dagirim .*

*Ez ne nêçîrvanim çend pez-koviyan ji Sîpanê Xelatê, çend mêkewan ji Bagokê bigirim bînim ber derê zindanê ji te re serjêkim .*

*Ez bê alim nikarim herim dergehê Avahiya netewên yekbûyî bihejînim .*

*Ez çi bikim, ez bazekî per şikestî me, ez dîlkiriyê Girnewas im ez dîlkiriyê hov û berberên rojhilat im .*

***Abbas ISMAÎL***
***Qamişlo 15 ê Gulanê- 1998***

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## *Pêşgotin*

Rexnevanê toreyî û pisporê çîroka Rosî (Xînadî Basbîlov) ser kurte-çîrokê wiha dibêje : ( Kurteçîrok rengek ji rengê toreya dastanî a pexşaneye, ew bixwe bejn kine, û bûyerên wê biçûkin û lehengê wê hindikin.)

Ji ber wilo çîroka-kin an jî kurteçîrok bûyeran himbêz dike û dixe di nav qaqilekî teng de, digel ku ev bûyerane her tiştî bi alî xwe ve dikşînin, lê ev nabe kiras ku em herdem li bejna çîrokê bikin, çimkî em gelek çîrokên dirêj-mîna dastana- dinasin, wek çîroka (paşeroja mirov) a nivîskar Şoloxof û çîroka (keça Sultan) a Boşkîn, û herwekî di vê berevoka nav destên me de (çîroka beg û axa) a ku mamoste Ebas weke kurte romanekê ristiye .

Hunera çîrokê li bal gelên rojhilata navîn rehên wêyî kûr hene, çimkî ev rehane têne girêdan bi toreya gelêrî a devokî, wekî, dastan, efsane, gotinên pêşiyan , serpêhatî û pêkenok, lê babeta (çîrokê) cudaye ji toreya devokî, ji ber ku toreya devokî hatiye guhestin ji nifşekî kevin ta nifşê nû di riya guhdanê de, lê çîroka nivîsandî rewşên wêyî taybet hene, çimkî bi zimanekî toreyî xurt tê nivîsandin û li ser bingehin hunerî û peyvin wêjeyî têne

Institut kurde de Paris

hûnandin, mîna van çîrokan: (çîrok a Gotê ) û (karmin a Mîramyê), û herwekî çîroka (Çelebîyê) li bal mamoste Ebas .

Li vir em karin bêjin ku navê (kurte çîrokê) ne ji mêj ve bikar hatiye, û gotina (çîrok) herdû celebên çîrokê a dirêj û a kin himbêz dike . lê heta dema dawî jî nivîskaran û rexnevanan di navbera cureyên toreyî de şaşdibûn û bi taybetî di nav kurte çîrokê û çîrokê de . Tişîxov û Mobasan bi çîrokên xweyî navdar, danasînek dane çîrokê û gotin: (Çîrok berhemek toreyî pexşan e û ji qetê navîne, naveroka wê serborek civakîye, ji nivîskarê wê tê xwestin ku di rengê çend derîyan de şirovebike, û lehengên wê bide berçav kirin.)

Bi vî rengî çîrok û kurteçîrok di jiyanê de rêz bi rêz û gav bi gav digel pêşveçûna romanê bûn Ta di nav Ereban de vê dawîyê nivîskarin pispor peyda bûn, ji nav wan kesên ku bi romanê ve mijûlibûn:(Hina Mînê û Necîb Mehfûz) bûn, û ji kesên ku xwe bi kurteçîrokê ve mijûl kir (Mehmûd Teymûr) bû .

Herwiha min di vê berevokê de çend çîrokên toreyî bi pexşaneke şêrîn xwendin, digel ku em zanin di nav toreya kurdî de; pexşan ji alîkî ve, û çîrok ji alîkî din ve pir kême û bi taybet di nav kurdên Sûrîyê de ...

Institut kurde de Paris

Di nav van bîst salên dawî de, hin pexşan hate belavkirin û çend çîroknivîs hatin xuyakirin.. wek.. Bavê Nazê dema çîrokên xwe ê binavê (Hêsr û baran) weşandin, digel herdû romanên xwe (çiyayên bi xwînê avdayî û Stokholmê te çi dîtiye bêje)... û di van salên dawî de, ji bilî nivîskarên meyî ku bi Erebî dinivîsînin.. çend çîroknivîs diyar bûn; mîna (Helîm Yûsif û Pîr Rustem ....) û aniha mamoste Ebas bi hemî hunera xwe derbasî vê meydanê dibe, digel serborên şêst salî ji temenê xwe û herdû berhemên wîyî kevin....

- Gula Civatê (kurte-çîrok) –1995

- Çîvanok û pêkenok (1996)

Serbora mamoste Ebas di vê berevokê de gelekî pêşde çûye.. ango, çîrokên wî vê carê dirêjin bi gotinin şêrîn û hinerîyeke bilind hatine xemlandin.

Di çîroka (kesk û sor) de, serpêhatiyên gundiyan li ser dema Osmaniyan dihûne û kirasekî nû lêdike..., bê çawa şer ji zarokan de destpêdike û dawî li çi stasyonê radiweste.

Û ji xwe çîroka ((nivîskarê mezin)) .. bi tevayî, rewşa piranîya xortên meyî nûne, yên ku dibêjin û napêjin, bê çawa di jiyaneke mîtefîzîqî de jiyan dibin bêyî ku li gewdê xwe binêrin, lê M.Ebas bi çend gotinên hilû çîrokê

Institut kurde de Paris

dixemilîne dema pesnê roja mirina lehengê çîrokê dide..(*Rojeke dev liken, tavikek tîrêj sist, asîman û derya weke du çavên şîn û beloq xuya dikirin, wê rojê çiya bêtir dernexûmî bajarê Beyrûtê bibû, mirov dipelikan, ditirsî, ku biser bajêr de bi herife,wê rojê(kolana sor)bêxwedî ma bû,..)*

Lê di çîroka (Kurê Bizinê) de olperstiya di nav kurdan de ji mêj ve ta dema îroyîn de dide xuya kirin û xaveya mejîyê mirovê gundî dide diyarkirin.... li vir mamoste Ebas dawîya çîrokê vekirî dihêle bê ku çareser kirinekê ji van gundiyan re bibîne ... .

Û ji xwe çîroka (Çelebiyê)M. Ebas felekata radike ...ji ristina çîrokê û pesnê lehengê Çelebîyê û bûyerên wê ta bi dawî, tev dikeve dilê xwendevan , nemaze dema nivîskar pesnê qehremaniya Çelebîyê'dide: *(Çelebiyê ev bûyer dît, mûyên mêraniyê di hinark û dêmên sorgulî de çikilîn, weke hespa ku li ser herdû lingên xwe yê pêşî raweste û pêl dijminê siwarê xwe bike. Çelebiyê weke bazekî birçî xwe berde ser kîvroşkekê .......)*

. Eve çend çîrok bo nemûne me ji xwendevanan re şirovekirine.. û ên mayî hûnê têxin bin dûrbînên xwe.

Ma ku em bêjin, kêmasiyên li bal M.Ebas berçavbikin... di gel ku nabin kêmasî, çimkî

Institut kurde de Paris

rewşa nivîskar jî perçak ji rewşa konevanî û civakî a kurda ye.....

Lê eger me tiştek jî got wê evbe: M.Ebas pênûsa xwe gelekî ji diwêta gencîna (xizna) kelepora kurdî dagirtîye ji ber vî hawî wê xwendevanên vê pertûkê hest bibin ku herdem çîrokin folklorî dixwînin, digel ku nivîskar bi taybetîyek xweyî kesanî xemilandiye.....

Di dawî yê de, ez karim bêjim wê xwendevanên hêja sûdeyekê baş ji xwendina van çîrokan bibînin, çimkî tijî gotinên gundî ên şêrînin... pend û gotinên pêşiyan têde hene û hin caran jî ramanin konevanî têde peyda dibin.

Ebdulbaqî HUSEYNÎ
Qamişlo-17.5.1998

Institut kurde de Paris

# *TÊBÎNÎ*

Dibe gelek nivîskarên ku van çîrokên min bixwînin bibêjin: Ev çîrokin folklorî ne, ji devê kal û pîran hatine girtin, birastî ez xwe pir payedar û şahnaz dibînim çaxa ez folklor dicivînim û dinivîsim, ji lewra paşdema me wê bihezaran çîrokvanên nûjen peyda bibin, lê mixabin wê çîrokbêjên folklorî biqedin, winda bibin .

Bo xala çûyî ez dixwazim xwendevanên berêz zanibin ku piraniya van çîrokan min ji hiş û ramanên xwe afirandine, bilî çîroka (yewel ya kurdî) ew jî min gelek rêşî û gulik û dûvik pêvekirine, tev ku min nedixwest ez wê daxim nav koma çîrokên din, lê hevalekî ew pejirand, ez xistim bin fediyê ku ew jî bikeve rêza hevalan .

Di nêrîna min de çîrokên min yên binavê: kurê bizinê -Çelebîyê- Baba Derwêş- çîroka beg û axa û Xelefê Gavan, û (tirba ling) di pirtûka min ya binavê (Gula civatê) de ev kurte-romanin, ne dûre rojekê xortek pispor û şanoker wan di warê şano û Sînema de bikar bîne, ji ber ku ev çîrok

Institut kurde de Paris

rewşa kurdan di sedsaliya/19/û serê ya 20an de baş baş berçav û dahûrandin dikin.

Xwendevanên hêja û hişmend ..

Ez dizanim wê gelek xortên çîrokvan û nivîskar bibêjin: Ev çîrok serbûriyên kevnar in, çîrokin kilasîkî ne, dema wan bûriye, lê bersiva min ji wan re eve :

1-Ev çîrokên gelê kurd in, ev wêne û tabloyên civata kurdî ne û demek dirêj ji dîrok û jiyana wan şirove dikin, (jiyana civakî-ya abûrî- bûyerên wê demê- danûstandin û têkiliyên wê çaxê- celebên hoz û çînên wê demê didin nasîn) .

2-Ev çîrok gelekî li ser pesn û rewşa pîreka kurd radiwestin (payedariya wê- sozdarî û wefedariya wê qehremaniya wê- rola wê ya civakî û kesîtî) .

3-Naveroka van çîrokan bi xurtî şerê kevne-perestiyê, axatiyê û şêxitiyê dike, êş û derdên wê demê, stemkariya wê demê bi xortên îro û sibe dide nasîn.

Institut kurde de Paris

4-Navin dîrokî û cugrafî di van çîrokan de hene û hin xalên giring di nav dabaşa wan de serê xwe radikin, çêla wan dibe ew hemû rastin, ji lewra ez li xwe ewle me, û min hemû dîtîne û di biwara wan de min xwendiye, bi taybetî dabaş û dîroka Eyûbiyan .

5-Rewşa kurdan ya polîtîkî didin nasîn, bê çawa kurd weke beranên poşek berevanîyê di ber berjewendîya dijmin de dikin û piştî quloçên wan ko dibin poşman û stûxwar diçin ber kêrê.

Xwendevanên delal...

dema ez çîrokê dinivîsim ez gelekî serê hespê xwe radigirim bo di nav bax û bexçê çîrokê de cirîdê bike, lê ez çibikim serî ji min distîne, xwe berdide qada romanê pêkoliyê dike, qewxe ji lehengên wê dixwaze, ez lava û tika dikim ku bibim swarekî cengê, hespa xwe li mêrga romanê biçêrînim .

Heger kêmasiyên min hebin min bibûrînin, ez bendewarê rexnên we me .

*Abbas ISMAÎL*

Institut kurde de Paris

# NIVÎSKARÊ MEZIN

***-Kurd dibêjin:kuna qitikê ye û hêkên betê dike .!***
***-Kurd dibêjin :kevirê mezin ne nîşana lêdanê ye.***

Cemo bixwe navê wî Cemşîd bû , lê hevalan navê wî sivik kiribûn jê re digotin : mamosta Cemo .

Cemo mirovekî bêxwedî bû ,nenas bû, gelek tişt ji kesîtiya wî veşirtî bûn, geh digot: ez Kurdim ji aliyê Bav ye , û diya min Farise,geh digot: Ez kurê Başbazirganekî me, û bavê min li Îranê xwest keça amê min bi kotekî li min mehr bike ,min xwe neda ber vê biryarê, neçare ez reviyam hatim vê deverê, geh digot min li ber destê Mela xwendiye ,geh digot :Min li zanîngeha Tehranê xwendiye ,yek caran digot :Ez Sinî me û car caran digot : Ez Elî Îlahî me .

Cemo mirovekî gewde gir bû , qam direj bû,rengê çehrê wî gewr û genimî bû ,riha wî her çax berdayî bû ,tevlîhev bû ,weke pûşê ku babîsok pêre şer bike, simbêl boq bû,lê dema dawî tayên simbêlan bi melûlî xwe berdidan nav riha wî ,awirên wî tûj bûn,bi dijwarî awirên..yê himber wî diqurquçandin ,

Institut kurde de Paris

ewî bi vê pergalê bi vî qilafetî dikarîbû hevalê xwe bal bi xwe de bikişîne , hiş û ramanên wî dîl bike ,her dem çentayek bê temtêl ,reng kelpitî dibin çengê wî de bû, pênûsek erzan di bêrîka wî de bû ,cilên wî tev qirêj û gemarê ûtîkirî bûn , qenewatek deh rengî di qirka wî de bû ,ta ku mir ew nehate guhertin , her êvar dixiste bin palgeha xwe, bo rast bimîne ,ji ûtî nekeve,Cemo hişmend bû ,guh miç bû ,zû navan û bûyeran xwe bi mejiyê wî ve digirtin ,ziman şêrîn bû, armanca wî di jiyanê de civat û hevpeyvîn bûn xwarin û vexwarin jêre ne derd bûn ,lê qalûn kêş bû ,tûtin bav û birayê wî bû ,pir caran çixarê xwe bi qiraxek lêvên wî digirt ta ku vedimirî ,simbêlên wî û hinek ji riha wî ji dûwa çixarê zer û tarî bibûn .

M.o.Cemo bajarê Berûtê bi çiyayên wê, derya wê tax û kolanên wê hemû şopandibûn, pelandibûn ,çi kesên ku li ûtêlên Cada Sor ( şari el Hemra) dinivisîn û li aşxanên wê dixwarin ,li çayxanên wê li meyxanên wê vedixwarin ewan M.o.Cemo nasdikirin M.o.Cemo bibû pûtek li her koşeyê hatibû danîn, ewî di her qozîkê de hevpeyvînek bi kurtî, li ser piya, ji hevalan re

çekiribû ,pirtirîn hunermend û torevan û rojnamevan ,çi Kurd çi Ereb ew nasdikirin, hemû didan ber qelemteraş û zixtên rexnan , ewan dilê wî nedihiştin, biken bi laqirdî pêre şalûzî dikirin ,yek caran sixêfên wî dadiqurtandin li xwe ne dikirin bar ,gelek caran destê xwe li nav milên wan datanî ji wan re digot :Hîn hun kêm ezmûnin, riya we dûre .

Rojekê Cemo hunermend Seîd Yûsif dît jêre got: Birayê Seîd ez vê demê pir xwe diwestînim , ji ber ez bi şev û roj kardikim ez simfoniyek Kurdî dadimezrînim , lê birayê Seîd ne weke simfoniya Bithovin û Baxe, na.. na mixabin tu tizbiya min bi ya wan re berdî ,ezê demeke dî wê kuta bikim,tu wê guhdarî bikî û hunerê birayê xwe bibînî .

M.o.Cemo bihîst ku Şêrîn Mele xwe hînî stiranê dike çu jê re got : Keça min nabe tu awazên her kesî bistirînî, tuwê bîna xwe li min fireh bikî ,van çend rojan ezê ji te re awazin nûjen û bilind amade bikim, wê bi saya wan dengê te li cihanê belav bibî .

Carekê Cemo pêrgî Seydayê Cigerxwîn hat himber wî rawestiya jêre got: Seydayê delal ez van rojan gewşe me, karê min pir



Institut kurde de Paris

girane ji lewma ez dereng mame nehatîme seredana te,ez karekî giranbuha ji Kurdan re dikim, lê mixabin ev miletê belengaz û nezan tu caran dost û dijminê xwe ji hev cuda nake, ezê nêzîk destana Gelgamiş wergerînim zimanê Kurdî ,û destana ku min ristiye wê çapbibe ezê ji te re diyarî bikim , lê Seyda min bibûrîne ez gelek fihêt karim çaxa ez dibêjim rista min ne weke ya we çend ristevanên Kurde ,ez xwe himber Firdewsî û Nalî û Şewqî dinavînim .

Dema dawî Cemo pir perîşan û xizan bû , şût û rût bû ,hevalan guhdan û alîkariya ku jê re diherikî bendav kirin ,rabû çu xwe gihande serok Kemal Canpolat jêre got : M.o.Kemal ez dîrokvanim, mêjûnivîsim ez anuha dîroka Kurdan berhev dikim ,ji lewra dîroka malbata we jî beşek giringe ji vê dîrokê ,ez sozdidim ku baş li ser rawestim û dabaşa vê malbata qehreman berfireh bikim, dûv re M.o Kemal tu xweş zanibe ez ne weke her dîroknivîsim ..na ..na ez pir birastî û zanistî dinivîsim ,wê piştî demek kurt pirtûkên min di vê babetê de çap bibin ,ezê ji te re diyarî bikim.

M.o Kemal ji pist masa xwe derket, pêre birêket ta devê derî ,hinek dirav bi toreyî hepişandin berîka wî û jê re got : Xwedê temenê te dirêj bike .

M.o Cemo bi vî rengî ,bi vê rewşa razberî, jiyanek rewrewkî ,bê jin, bê zarok dibûrand , mixabin feleka bê ol baskên xwe li Cemo pêçan ew avêtin newala êş û derdan ,roj bi roj melûl bû ,pişt qop bû ,devkox bû ,awirên wî şikestin ,xewnên wî tamara mirinê jê re berçav dikirin , gotinên wî tewş û çewt bûn, hevalan xwe ji ber vedişartin,heger yek bigirta nema bihesanî ew ji nav lepên wî riha dibû .

Rojeke dev li ken,tavikek tîrêj sist, asîman û derya weke du çavên şîn û beloq xuya dikirin,wê rojê çiya bêtir demexûmî bajarê Beyrûtê bibû ,mirov dipelikan ,ditirsî ,ku biser bajêr de biherife ,wê rojê (kolana Sor ) bêxwedî bû, dîmen û pûtên wê hatibûn perçiqandin, kundê malwêran bi şahnazî dixwend , wê roja bê bext . Muxtarê taxê û du polîs derbas bûn nav komek heval û cînar, bihev re (fatîhe) li ser giyanê Cemo xwendin, bihev re oda wî ya sêwî pelandin ,pirtûkxana wî ya ji du malikan ,pel bi pel serhev xistin ,

Institut kurde de Paris

mixabin ji bilî çend wêneyên endamên perlemana Libnanê tiştek nedîtin .

Institut kurde de Paris

# KESK Û SOR

Ewran kirin reqe req ,kirin gume gum , tavek buharî baran û teyrok pêre ,girt ser gundê Berojê, bû xure xura baran û teyrokê, toz û dûman ji ruwê qadê bilind bû, avê hevûdû ajot, qir û qirêja nav gund bixwere rakêş kir, avêtin newala jêrî, piştî bînekê tav ferikî, ewr xêz vêz bûn, asiman kincên şînî vekirî wergirtin, bû qure qura beqan, ala xuristê ya kesk û sor li ser eniya asîmana hat raxistin .

zarokên taxa jorî terîş bi serê darên xwe vekirin, xwe berdan taxa jêrî, paç û terişên xwe bilind dikirin, bi hev re bi yek dengî digotin : kesk û sor li mala me ..mişk û mar li mala we, çaxa ev deng li sikak û kolanên gund li hev vegeriya zarokên taxa jêrî bihîstin, weke kulmozê li wan derbûn, darên wan şikandin, terîşên wan zîvar zîvarî kirin, ew ji hev tarmarî kirin, ew şerpeze kirin, û bisr de kûçikên xwe sor û germ kirin ajotin aliyê wan ji wan re gotin : Hay Beşo .. Hay Swar .. hay Segvan, kûçikên taxa jorî ewte ewt bihîstin, derketin himber yên din rawestiyan, ketin nav hev bi dev û lepan

Institut kurde de Paris

pûrta hev weşandin hev birînkirin, sîpên herdû taxan ketin pêxila hev serî li hev kirin kod, kirin delavê xwînê, hinek ji wan dinav xwînê de vegevizîn, bê hiş bûn, zilamêd herdû taxan kişiyan halan û qewxê,ketin cengê weke şêran term û laş ji hev raxistin, keç û pîrekan bixwe li nava taxan daqilîçî hev bûn porê hev kurr û kem kirin, namûsa hev anîn perakî bi qul, dengê nayhildanê hewar û gaziyê hişt ku şivan û gavan pez û dewaran berdin li car û newalan bihêlên ji guran re, ew jî hatin şer û halanê .

Gundê Berojê avabû, di pesara çiyayekî bilind de bû, herdû tax sînorên wan çemek zixurî av zelal, û tenik bû, raser kaniya wî çemî qereqolek Turkan ji keviran hatibû avakirin, çar cendirmên zingorî, bê pergal têde bûn, ji xwe dewleta Elî Osmanî hay û bay ji wan tune bû, her çend rojan cire diket nav gundên wê deverê, ewan cendirman ew digrtin saqoçermî dikirin, gerekiyên xwe û yên hespêd xwe ji pişta wan radikirin.

wan cendirmên bê xwedî bê hêz ew qehreman û gernasên Berojê civandin weke berxikan koz kirin, hemû xistin axurê hespan, yek ji xwe li ber wan hiştin, û yên



Institut kurde de Paris

din ketin nav gund tiştên û karên nedîtî û nebûyî di pîrekan û kalan û qîzan de kirin .

Gundê Berojê ket tengahiyeke pîs û xerab, bihara wê ya rengîn, qurquçî, kulîlkên wê bîna xwe firandin, giyayê kesk zirhimî, çilmisî, pez û rez bê xwedî man, cot û cobar hatin berdan, bêrîvanî bê deng bûn, hore hora cotkaran û karwanê aşvanan di axurê hespên cendirman de hat veşartin, bangdana dîkan û qidqida mirîşkan dinav darên bexçê qereqolê de hatin dîlkirin zarok çirisîn, melûl û lar bûn.

şêx hat gund ji pîrekan re got : sedema vê kuştinê, vê girtinê, vê bêtarê nedana zekatê ye, divê serê malê berxekî bike qurbana ûcaxan, şêx çend şevan li taxa jorî nivist û çend şevan li taxa jêrî, pişt re axa hat, çû taxa jorî pîrek li xwe civandin weke Dîkê Elo Elo xwe werimand ji wan re got: zilamên we bênamûsin, gerek deh mêr ji taxa jêrî binax bikirina, pişt re çû taxa jêrî ji wan re got: zilamên we bê olin bê kêrin gerek taxa jorî bisotina nêr û mê biqelandina, wêran bikirina, li wir jî zirt û fortên xwe kirin, peyayên wî çend berx û beran dane berxwe û



Institut kurde de Paris

gund dinav girîneka nexweşî û berberiyê de hiştin.

Gosirmet û bêtara Berojê ne bes bûn, mîrata ( Hala zer ) ya malxerab raperûşkên xwe dirêj kirin hinav û cigerên mendalan, bahoza wê Halê koma zarokên kesk u sorê danîn ser milê xwe ew birin avêtin bajarê mişk û maran.

* * *

Institut kurde de Paris

# *KURÊ BIZINÊ*

Çend malên Koçeran ji sermyana xwe berdan Germyana, di ber pala çiyayê Bagokê de, raser bajarê Nisêbînê konê xwe danîn, pirtir kêfxweş bûn dema ku dîtin deştek rengîn û panavek fireh û dirêj di binya wan re ye, xasme çaxa ku pîrek û etarên bajêr biser wan de qûriyan, şîr û penêrê wan, hirî û berxên wan dikirîn.

Bazirganên Nisêbînê ji Fileh û Cihûyan û çelebiyan bûn, gelek tep û rîp û fen li wan koçeran dikirin, bi zarê xweş lav û sûndên asê qatixê wan bi nîvê buhayê wê ji wan distandin, heger du bazirgan li bin konekî li hev rast bihatina, bi zimanê Erebî dibûn hevpar ew dixapandin, piraniya wan jî nanê sûkê û helaw û tametîtk ji wan re dibirin, çavên wan pê digirtin, pîra Xatê li bajarê Nisêbînê binav û deng bû, çi girêka kor heba bidestê pîrê vedibû, û heger ewê girêdaba, serok canbazên Amedê nikarîbû veke.

Pîra xatê guhdar û çavnêra êla koçeran bû ta ku zanibe wê çi demê warê xwe biguhêrin, ji lewra ev çar şevin diya Mûso bidizî têye

Institut kurde de Paris

kunca pîrê wî şîrdidê, û vedigere mala bavê xwe, xemla qîzan werdigerîne xwe, roj şêrîn bû, her kes kete ser pişta karê xwe, pîra Xatê bigiranî cewdikek av xist aliyekî xurcikê û pêçeka Mûso xist aliyê din, Pîrê li kera boz siwar bû, berê xwe da bakur,di ber perê newalak kûr de berqefek di çav xwe rakir ew berqef di zinarekî nêzî şûn warê koçeran bû, pêçeka Mûso xist berqefê û di lingê lingdan de vegeriya.

Xelê şivan piştî jiyanek bi kelem û kul, jinek anîbû, û çend kulekên wî jî çêbûn, ew kulek dê û bav û mendalên wî bûn, ew ling û destên wî bûn, ew digerandin li qelaçan li newalan, cihek nema li wê deverê ew lê neçêrandin, kewtê bizin û mihên Xelo bibûn weke hevalêd wî, ew bûn dost û civata wî, Xelo û kulekên xwe hînî zarê hev bibûn.

Caxa Xelo bihîst koçeran war berdan ewî kewtê pezê xwe ajot ber bi şûnwaran de, bizina Xelo ya kol xwe li berqefa zinar girt û çit li ber derê berqefê li ser teriya xwe rawestiya kire maremar, Xelo û hevalêd wî naskirin ku ewê tiştek dîtiye, kîfroşke, mare, sewalek seqete, bê guman tiştek heye, Xelo çû ber pêde dît ku bizina kol raser pêçeka

Institut kurde de Paris

zarokekî çit bûye, lê ew zarok hema bi kotekî devê xwe vedike, Xelo nemerdî nekir bizina kol ajot bir guhanên wê biser lêvên wî kurmikî de dotin, ji wê rojê de bizina kol li Mûso baniya û bû kurê bizinê.

Xelo bikêf û şahî ew pêçek bire malê, Xanima wî ya kurdûnde tika û lava kirin, ku ev dana Xwedê ji wan re bimînê, Xelo û jina xwe ya nagir kurê bizinê bi histirên çavan, bi xewrevîna şevan, bi goştê tilûran, bi tametîtkên Etaran ew mezin kirin, navê wî kirin Şêxmûs, ji xwe re gotin: dibe bav û kalên wî ûcax bin ev nav hinkûfe, lê mixabin her gundiyan jê re digotin kurê bizinê.

Şêxmûs mezin bû, Xelo ew xiste ber melê, hînî Quranê bû, melayê wî bi kişmatî li hiş û mejiyê vî kurî dinêrî, yek caran bilêvkirin melayê xwe rast dikir, di xwendinê de çira melayê xwe dibir, gelek caran ewî ji suxtan re dixwend, rabû mela ji Xelo re got: mixabin ev kur dûrî xwendinê bimîne, vaye Quran kuta kir divê tu wî rêke Camiya Mazil Ebdîn li Nisêbînê, ta ku diwazde ilmî bibe hûnê hemû bixêra wî herin bihiştê.

Çaxa kurê bizinê Quran kuta kir, bû sîpe, hat nasîn ku Kose ye, bê rih û simbêle,

xelkên deverê digotin:diberqefê de mîza maran li rûyê wî ketiye, hinekan digotin ji ber ew pîçe Xwedê wisa pêkiriye, bilî devrûtiyê, tu kêmasî di laş û qilafetê kurê bizinê de tune bûn, û çaxa ku çû Nisêbînê ewî her kêmasî veşartin hingî zîrek û zane bû, hingî evîndarê xwendinê bû, şagirtiyên camiyê hemûyan xweziya xwe pê dianîn, demek kurt Şêxmûs şaşik û kom wergirtin serê xwe, diwazde ilmî bû, bilind bû, bizin ji bîr çû, baba Xelo ji hiş wî dûrket û dawî bajarê Nisêbînê li pişt xwe hişt, berê xwe da bajarê Urfayê.

Li camiya Ibrahîm Xelîl rojeke înê ji Şêxê wê xwest ku ew derkeve ser menberê û ji ber ku berê Şêx hunerên wî dîtibûn, ew jî kefte bibû rê da Şêxê devrûtik.

Şêxê devrûtik ket nav tika û lavan û xwendina Quranê, bi dengekî zelal, bi zarekî şêrîn û beyan Camî hejand, guhdar xistin bin siya sawêran, bi wan da nasîn ku ev bajar û hêl kevnwarê pêxembera ye, cihê comerdî û dilovaniyê ye, rûniştgeha qencên Xwedê û oldara ye, kurte pist kete nav guhdaran ji hev re digotin: çawa ev şêx bi cibe û şaşike û bê rihe bê simbele, yekî ji wan re got: min li

Institut Kurde de Paris

camiya Nisêbînê bi dûvde nimêj kiriye, wê çaxê bi rih û bi simbêl bû, dibêjin şevekê ûcax hatin xewna wî û sibehê rabû dît ku mû bilaşê wî ve nemane, lê dibêjin ji wê rojê de dergehê ( razaya pîroz ) li ber vebûye, her bûyer û kiryarên qenc û xerab jê ve xuyane, û ûcaxan kilîta deriyê gelek êşan û girêkan dane wî, dînê ew destê xwe diser eniya wî re bibe, wî ji dîlkirina cina riha dike. Navê şêxê devrût derket ku tawiyan û bawiyan dike pehlewan, sewsiyan û evîndaran bi miradê wan şa dike, çi nexweşên ku bi salan derd û êşê dikêşin xwe li Şêxmûsê Avzel girtin, bi şêxê camiyê re peyman danîn, ew kire hevparê xwe, maldar û xanedan bû, kesê wê Berekê bi serde qûriyan.

navê wî sînor derbas kirin, pesnê wî kete ser her zimanî ewî sê jin markirin, lê zarok jê re çênebûn, Sofî û şagirtî û mirîdên wî digotin: Ev bixwe destên ûcaxan têde heye, ji lewre dibe zarok wî gunehkar bikîn hinekan digotin giyanê wî û laşê wî ne wekeyê ne weke yê mirova ye bê hestî ye.

Xelo yê şivan ketibû rewşekê heg mirov ji hesinê Pola be nikare xwe li ber bigire, jina wî çû bi dilovaniya Xwedê şa bû, deh



Institut kurde de Paris

nexweşiyan û derdan nikilên xwe di laşên wî de çikandin, heval û hogir ji dorê belav bûn, her çax û her roj dikire niçe niç, keserên poşmaniyê kûr ji hinav û cergên xwe berdidan, bixwe re dipeyivî, bixwe re şer dikir, ji xwe re digot: Xwezî min zanîba ew piçê kurê bizina kol zindiye.. mirîye..? û bela ev terîşên kirasê perpitî jî li min tune ba, lê ez çi bikim qey raste.

mirov ji kurhiliyan re nabe bav, û xwîn tu caran nabe av..?

gelek hevalan ji Xelo re gotin: Van çend bizinan bifiroş û her Rihayê nik Şêxmûsa berdevkê mîrê cina wê te ji van êşan û kulan riha bike, te vegerîne xortekî çarde salî ser hemd û hêla berê, ewî serê xwe dihejand û dibeşişî, û mir bi dîtina şêxê devrûtik şa nebû.

Institut kurde de Paris

# *ÇELEBIYÊ*

Gundê Berekê di beriya mêrdînê de binav û deng bû, bêtirî sêsed malî li berpala girekî bilind ava kirî bûn, dû çeman xwe ji çiyayê Mêrdînê berdidan, serberjêr dibûn, xwe li gundê Berekê dipêçan weke du maran, û dawî serê xwe li dûavê dixistin newalek kûr û fireh.

Rûniştvanên Berekê karkir û cotkar in zîrek bûn, rewşa wan ya abûrî xweş bû, hemû yek dest bûn, di xêr û şerê hev de bûn, nemaze axayê wan gelekî birûmet bû, aştîxwaz bû, xanedan bû, du jinên wî hebûn, lê ya delaliya ber dilê wî Çelebiyê bû, gelek kesan digotin axa ew himber zêr û zîv kir ta ku bû şûya wî, Çelebiyê keça Efendiyekî Mêrdînê bû bê hawe spehî û şêrîn bû, wisa ji rênas û raman zelal bû, jinek bê hempa bû, sê ziman bû, çaxa ku derdiket seyranê wey li wî kesî be yê ku ji xwe re bînekê lê temaşe bike, û pîrekên gund digotin: çaxa Çelebiyê paqên xwe tazî dadihêje ava çem, laşê wê ji ava çemê zixurî zelal û gewr tire, mirov

Institut kurde de Paris

dikare wêneyê xwe di goştê laşê wê re bibîne.

Gundê Berekê li çirra xizaniyê xistibû, gundî weke mîro beyanî diketin nav kar û barên xwe, cot û cobarên xwe, lê her ber êvarî civata pîrekan li ber dîwaran û bin siya daran digeriya, û ya zilaman li ser bênderan û gastîna gund digeriya, hinekan bi zixurên Rica dileyistin, hinekan bi sêberkê dileyistin, hinekan bi xar û qurûş dileyistin, piştî şîvan piraniya wan xwe li oda Şerîf Axa digirtin, çîrok û çîvanok digotin, dabaşa mêrxasan û kurêd bavan li dardixistin, şano û tenazî û laqirdî bi hev re çêdikirin, bi hinguliskê dileystin, têkiliyên gundiyan bi hev re hemû xweşî û berêzî bûn, heger şaşîtiyek, ziyanek, neqenciyek li gund derketa, Şerîf axa bilez destê xwe li ser birînê datanî û derman dikir Şerfî axa li rêzan û keyê xwe yê zîrek vedigeriya, her dem ji xulamê xwe yê zane û guhmiç re digot: biner Mendo: divê tu tevgera gundiyan nasbikî, çavnêrî hûr û gir bî, kutkutandina çavan bijimêrî, tev ku gundên wê deverê dinav girêka dubendî û berberiyê de bûn, gundê Berekê, asîmanê wî bê ewr û toz bû, bilî dubendiyeke nû rehên

xwe û şaxên xwe hêdî hêdî berdidan tax û kolanên Berekê bîna dubendiyê kete pozê rûniştvanan, roj bi roj akama xwe li hiş û hestên gundiyan dikir, dubendî bêtir berz û kifş bû, bi taybetî di nav pîrekan de, bendek ji wan bûn hevalên Çelebiyê, benda din bûn hevalên qîza Hesen axa, lê dubendiya zilaman ew bû, beşekî ji wan digotin: hespa Şerîf axa ya qumer xwedan nijade, beşê din digotin: hespa boz ..?

herdu bendên zilaman ji layê hezkirina Çelebiyê û dilovaniya wê dibûn yek, lê benda qîza Hesen axa li civata ber dîwaran dikirin piste-pist ji hev re digotin: Çelebiya bajarî, ya bê bav û bê xwedî, ya serberdayî, kes nizane bezê bin guhê bavê wê ji kuye..? ma kesî di dewr û zemanan de bihîstiye hewî dilbikeve kurhilyê hewiya xwe ..? ma ku ne eware û felîte ba wê çawa dilbiketa nuxuriyê Şerîf axa, û hin dibêjin ew nahêle, Şerîf axa here nivîna wê, jê re dibêje: dev bi girêzo .. dev lapûro .. temen qurquçiyo.. ma ez hinkûfî te me..?

Bi taybetî ya ku vê dabaşê belav dike û li her qozîkê digerîne Peroka pinpinok û gelac e ya bê xwedî, ya ku ji zarê wê xuyaye û têt



Institut kurde de Paris

nasîn ku ne Kurde, digotin: çawîşekî Turk bextê wê reşkir pişt re ew berda, tu êlan ew nehewandin lê Şerîf axayê dilovan ew li şivanê gund markir, ewê tevlihevê wê gerokê rojê çar civat diguhertin, her civat pesin û tometin nû ji Çelebiya bext reş re li ser cilikê radixistin, ewê digot: raste nazike, çêniye, gewre spiye, lê berf jî spi ye û Sa bi serde dimîze . gelek caran Xemlanê himber Perokê radiwestiya, raser wê dihat jê re digot: Bê kesê, por kemê, kes tune zimanê te jêke, porê te biser bav û birayê te de kurr bike, wey çavên te û çendek weke te derkevin, hûn dixwazin vî gundê têr û kerr li bin guhê hev bixin, wêran bikin, miradê dijmin lê bikin, dûv re Xemlanê destê xwe bilind kir û hejand dengê xwe hilda û got: ma gelo çima rojekê kesî ji we dabaşa finasên qîza axê ne dianîn ser ziman, hema bi Xwedê hûn ji Çelebiyê didexisin, ji we spehî tire, gewrî boze weke felqê qeşê ye, weke seriyek penêıê zozana ye, lê hûn reşikin weke hecîloka ne, de bese hûn û Peroka bêbext devê xwe bigrin, zimanê xwe ji biwara Çelebiye biguhêzin, çêtire Şerîf axa tep û rîpan bi hinekan bike, ji xwedê gunehe, ji Xwedê bitirsin, avê li agir

Institut kurde de Paris

bikin, ev gund nestêleye, li vê deverê ew bitenê bê berberî maye.

Roj ketiye zerikê, tîrêjin wê li jorî hêrikên başûr melûl mane, bi kotekî li berxwe didin bo neçin ava, Şerîf axa li ser dika odê çavpêl bûye, li rojava dinêre, li bakur temaşe dike, awirên wî qûnkên tirêjan dadiqurtînin, çaxa ku li bakur dizîvirî çiya û newalên Mêrdînê hemû diketin zerdika çavên wî winda dibûn, dema ku berjor serê xwe hildida stêrên nû çavên xwe ji xewa şêrîn vekiribûn diketin nav deviyên mijankên Şerîf axa ewan xwe li stêran didan hev ew dîldikirin, Şerîf axa wê çarîkê bi werîsê raman û gumanan ve hatibû daleqandin, bibû weke meşka şîrê serê biharê ku bi saryana sibê re tu bikilîne, di wê keledewê de berê xwe da gastîna malê û bi dengekî xurt û zirz bangkir Mihemedo kurê min bilez û bez here bêje wî segbavê Mendo qena zû were nik min, eve çend rojin ewî riya odê winda kiriye.

Mendo di lingê lingdan de berê xwe da odê, lê piştî çend gavan bê hemdan sist bû, lingên wî li hev ketin, bê hêz bû, lingek li pêşe û yek li paşe, ji xwe re dibêje ma gelo bi van çîrokan hay bûye..?

Institut kurde de Paris

ezê çi bersiva wî bidim..?Mendo bi giranî pêlpelûkên odê derbaskirin, û devê wî kete hev ta ku slavek da Şerîf axa, lê axa bê vegera slavê pêde peqiya.. Hey bêbext Mendo.. berdevko.. aqilmendo.. tu jî bi min re xiniziyê dikî.. ? nanê min kore ez qenciyê bi kê bikim wê bibe xerabî, ma raste Mendo ev qas bûyer çêbûne û gund mişt çirok û çîvanok bûye û tu pê hay ne bûye..! ez vê yekê tu caran ji te bawer nakim, çawa gund bûye dubendî, seqetî çêbû ye, tas çingirî ye, Peroka şîr heram namûsa min berbat kiriye, aniye qurûşekî bi qul, bi xerabî basa Çelebiyê kiriye, ma tu dibin guhê ga de ye.. yan tu ji min vedişêre.. hey nanê min bi ber çavê te bigre û pêvede, de rûne ji min re bêje û ta biderziyê veke .. yan jî ezê şeşxanê di serê te de vala bikim.

Rebenê Mendo sergêjek lê geriya, lerizî, dawî bê perka xwe avêt ber lingê Şerîf axa û giriya, bû perqe perqa wî û dinav re ket dabaşa cira ku li gund çêbûye, dubendiya pîrekan, dek û dolabên qîza Hesen axa ji axayê Xwe re got: ma axa çawa minê xwelî li serê xwe bikira, nûçeyên nuxuriyê te û delaliya te ji te re bigotina, bi Xwedê û



Institut kurde de Paris

kozika pîr Kemal evqas tomet û bêbextî derewin, û bi ya min be emê zimanê çend qeşmeran jêbikin, van çend geniyên li gund talan bikin wan ji gund biqewirînin.

Şerîf axa piştî baş guhdarî kir, xwe li ser derzika piştê ramedand, herdû lepên xwe xistin hev, danîn bin serê xwe, bîneke dirêj bêdeng bû, keserek kûr û bi tîn berda, mirov digot qey kezeba wî pêre derket, Şerîf axa nişka ve got: Hey Mendo kurê min tas hat û çingirî çi rast çi derew bê sûde ye, Mendo xwe karbike bê deng van çend rojan emê herin Mêrdînê ev Çelebiya rêzan û delal ne ya nav hovane û vê devera bi quncire, Mendo weke her car, xincer û qame xistin ber xwe, şûrê xwe binav milê çepê de berda, wisa Şerîf axa xwe bi çekên xwe yên taybet girêda tev şeşxana binav û deng ya ku yek weke wê li nik mîrê Milan hebû, Çelebiyê bixwe li mehînek boz swar bû, xurc û zînê wê hemû bi rêşî û gulikan xemilandî bû, Mendo got Şerîf axa : Gerek em newala Qutê piştî rojhilat derbaskin ji ber ku çete û keleş pirbûne, tu dizanî dexlê devera Mêrdînê qumbil xwar û kesên wê birçî ne. keleş her roj bişev rêwiyan tazî dikin, Şerîf axa bi

Institut kurde de Paris

tenazî got: mal xerab Mendo yek weke Çelebiyê bi me re ye, û tu xwe ditirsîne, Çelebiyê bi hêrz û kîn got: te çima qîza Hesen axa bi xwe re karnekir wê şerê te bilind bikira, wey xweziya min tu lê venegere.

Neçare karwanê Şerîf axa berî rojhilat nêzî newala Qutê bû, du keleşan xwe berdan pêşiya karwan, himber karwanê Şerîf axa rawestiyan, xwe bi ser rimên xwe de berdan û ji wan re gotin: Baca riya me bidin û herin hûn xatirê vê xanimê bin, em we nakujin.

Çaxa Çelebiyê çav li çetan ket rengê wê hate guhertin çavên wê sor bûn, hêrzan ew guvaştin, weke pilingek ser çêlikan li xwe nêrî, û beriya Şerîf axa bersiva çetan bide, ewê ji çetan re got: ji riya me derkevin hûn çine karwanê Şerîf axa tazî bikin, piştî wan tan û niçan, neçare Şerîf axa ajot ser yekî, û Mendo himber yê din rawestiya yê çete bi destê rastê şûr bikar tanî, û bidestê çepê rimek li parxwana hespa Şerîf axa xist, hespa boz xiliya, sist bû, bê hêz bû, terpilî, lê Şerîf axa weke çipik çit daket qadê û neçare dest avêt şeşxanê, lê keleşê zîrek û pehlewan bilez şûrek daweşand nav milê Şerîf axa yê



Institut kurde de Paris

rastê, milê Şerîf axa anî xwar, şeşxane ji destê wî pengizî û pekiya dûrî qada şer .

Çelebiye ev bûyer dît, mûyên mêraniyê di hinark û dêmên sorgulî de çikilîn, weke hespa ku li ser herdû lingên xwe yê pêşî raweste û pêl dijminê swarê xwe bike, Çelebiyê weke bazekî birçî xwe berde ser kîvroşkekê, Çelebiye xwe avêt ser şeşxanê û dest bidest di serê yê keleş de valakir, gava hevalê wî deng bihîst, ewî jî bazda xwe berda newalê, paşmêrê wan jî dest hilneda. Çelebiyê hibriya xwe li destê Şerîf axa girêda, û ew li pişt xwe swar kir berê xwe dan Mêrdînê.

Çelebiyê Qolana zêran vekir, textorê Mêrdînê û devera wê hemû li destê Şerîf axa civandin, lê mixabin destê wî jêkirin,û demek bûrî ta birîna Şerîf axa hatehev, Çelebiya bi soz û rêzan, keça Ibrahîm efendî, xwîniyê çiyayê Mazî, penaperê leşkerê hov û devlok, Çelebiya bajarî karwanê vegerê karkir, xwîşka xwe ya biçûk cilkir rehelkir xemiland, çete bixwe re derxistin, ta nêzîkayî li Berekê kirin . xweşî û şahî li darketin, govend û sema fireh bûn, xwişka xwe li nuxuriyê Şerîf axa markir. gundiyan û

Institut kurde de Paris

pinpinok û gelacan serê xwe tewandin, maqûliya Çelebiyê pîroz kirin, ziman dirêjan ji hev re digotin: me dizanîbû ev Çelebiyê ne qîza şeqal û beqala ye.... !

Institut kurde de Paris

# ÇÎROKA BEG Û AXAN

Dema Xelîl Begê Heskîfê neviyê melek Xelîl Eyûbyî û birayê xwe Îsa beg ketin kirê hev, rik û kîn kete nav wan, berberiya hev kirin, rabû Îsa beg ji ber Xelîl beg derket, çû Tora Mihelmiyan ya ku dikeve devera Merdînê, Êla Mihelmiya ew jî weke neviyên Eyûbiyan bi zimanê Erebî dipeyivîn, ji lewra piraniya wan Suryanî bûn, salekê buhabûn û birçîbûn kete wê deverê, baran kêm bariya, dexl û dan şîn nebû, mêwe û rez hişk bûn neçare Suryaniyan di wê deverê de qatix xwarin, rojî negirtin, Metranê Qertimînê (Dêr umer) fermanek derxist, ku li wan bixin û metranê mezin ew kes ji olê derxistin.

Lê beşek ji vê êlê, bi taybetî mîrekên wan, bi artêşa Eyûbiyan re hatin Kurdistanê, çaxa ku Eyûbiyan mîrekên Ertuqiyan guhertin ji heskîfî û Amedê û Farqînê û Rehayê û cezîra Botan derxistin, û mîekên kurdan xistin dewsa wan, pirê wan ji bajarê Humis, Hema, Şam, Helebê anîn, ew hînî zimanê Erebî bibûn, ji bo vê yekê Mihelmiyan xwe li dor Eyûbiyan dan hev, ew ji xwe re kirin mîrek,



Institut kurde de Paris

bilî dijitiya Xelîl Begî û îsa begî du bendên din di devera çiyayê Omeryan de hebûn hîn dijwartir û kambaxtir bûn ji wan re digotin: Mehmûdkî û E'tmankî ew dever bibû qada şer û qirkirinê, serê mirovekî hatibû nan û pîvazekê, her roj talankirin, sotin, kuştin, wêrankirin hebû.

Lê pirê caran gava ku Mehmûdikiyan û Etmankiyan hev bikuştina diçûn ber destê Begê mihelmiya (mîrê mihelmiya) ew li hev tanîn, ji ber ku axayên deverê birûmet û pîrozî li wan dinêrîn, bawer dikirin ku ew mîr neviyên Sultan Selaheldîn in, lê mixabin Osmanlî bi vê yekê haybûn, rabûn ew werîsê qenciyê û aşîtiye birîn, çelebî û Efendiyên Mêrdînê payedar kirin, ew kirin berdevkê walî û serok leşker, ew berdan nav kurdan, pif kirin guhê wan ew axayên hov li hev sor kirin, destê xwe li pişta wan xistin, ew dixwestin nik xwe bajarê mêrdînê xwarinên bajarî û tametîtk didane wan, ew kor dikirin, her axayek çelebiyek wî hebû, her yekî digot: Çelebiyê min li nik dewletê birûmete, bêtir cih girtî ye.

Wan çelebiyan bi vî rengî Kurd bihev kuştin didan, û xaka wan ya çiyê û beriya

Institut kurde de Paris

Mêrdînê, binavê xwe nivîsandin, axayên çiyê hov bûn, xwîn mij û stemkar bûn, ewan guh li xakê û rez û zeviyan nedikirin ew axayên seroktiyê û mêraniyê û pesnidariyê bûn, gelek ji peyên wan ji wan maldartir bûn, lê ewan digotin: wê dunya wisa bidûmîne û gund û rez û pezê êlê hemû yê me ne, mirov li ber çavê wan weke navmaliya bûn, himber axê weke kola bûn, weke pêşiyan bûn yekî ji wan carekê heft mirov spartin hev û tivinga xwe ya nû li wan ceriband fîşekek berda wan bo ku zanibe ka gelo gewdê çend zilaman derbas dike.

Axayekî bihîst ku yekî gundî xwe biqapan dike û dibêje ,dilê jinekê ji gund pêre heye, rabû axa şand dûv yê evîndar û jê re got: waye min zilamê jinikê şandiye aşekî dûr, tuwê herî ser xaniyê jinikê, heger tu xistî nav nivîna xwe, ji xwe ezê wê ji mêrê wê berdim, li te marbikim, lê heger tu tereskir tu qewirand,biserê bavê min ezê herdû guhên te jêkim. Dem havîne, tava heyvê xweş roniyek zelal berdaye cîhanê, civata axê geryaye, jinika reben li ser banê xaniyê xwe dinav zarokên xwe de razaye, ketiye xewa şêrîn, neçare yê evîndar berê xwe.da yara xwe û bi

Institut Kurde de Paris

pêlpelûkên xînî ve hilkişiya, jinikê pêjna wî kir, ji xew çambû, dît ku merovek weke xîpekî ye, hema çavê xwe girtin û devê xwe vekir, ew kir kûçik sqêf û dijûnek nema ku jê re negotin, ew cerisand, yê evîndar bazda biçolê ket, ku bi terqe xwe ji axa rizgar bibe, lê axayê bendewar du xulamên weke çipik şandin ew anîn ber dest û lingê axê, rabû axa guhek wî jêkir, dibêjin ew mirov çû û hey çû.

Axayên Beriya Mêrdînê (Binxetê) qure bûn defre bûn xakparêz bûn her yek xwediyê deh yan bîşt gundan bûn, kincên nûjen, solên sixtiyan werdigirtin bejin û lingên xwe, hinekan ji wan finasên pîs û qedexe dikirin, poz bilind bûn, ji gundiyên xwe re digotin: Ev kurmanc çi bê mejî ne ewan ji xwe re digotin: xwedê em kirine axa û hûn kirine kurmanc, wisa jî stemkar bûn, xwîn mij bûn, hevalê dewletê bûn, kar û suxre bi gundiyan dikirin, pîrekên gundiyan navmaliya wan dikirin, heger qîzek spehî û delal li govendekê Bidîtina ew bi zor û kotekî ji bavê wê distandin, piştî demek kurt ew diqewirandin, li xortekî yan kalekî ji navmaliyên xwe mardikirin, lê çaxa dibihîstin ku xortekî çav berdaye qîzek wan,

Institut kurde de Paris

heger ew bigirtina lêdan, fistoqî, girêdan, rûreş kirin, para wî bûn, dawî ew ji gund û ji Êlê diqewirandin, xaniyê bavê wî disotin ew ji koçebir dikirin.

Axayên beriyê maldar bûn, lê mixabin tiştek bi sûde pê nekirin, dezgeh ava nekirin bazirganî nekirin, hemû hatina xwe, û bacên ku ji gundiyan distandin dixistin devê karbidestên dewletê, û li çayxanê û meyxanê û cihên bê rê xercdikirin, bihezaran li aşxanan datanîn, bi sed hezaran li bajarên dûr datanîn û kovarek kurdî bi pênc wereqan nedikirin.

Di wê dema qirêj û genî de, qedexe bû ku dê yan bav li ser kurê xwe bigrîn, tenê xwişkê yan dê dikarbûn şîna wî bikişînin, pesnê qehremaniya wî û çelengiya wî bidin, hinekan stiranin û awazin pir giran buha di şînê de digotin , ta iro serbilindiyeke di folklorê kurdî de weke (felîtê Quto) bavê Fexriya (Ismaîlê Ehmed)

Di wê demê de kale pîran ji kur û neviyên xwe re digotin, zarokên xwe maçnekin, himbêz nekin bi wan şah nebin, ji ber ku her kuştin yan zindan. paşdema waye, ew berxên ber kêrê ne, belam li gelek deveran



Institut kurde de Paris

maçkirina zarokan ji aliyê bav de pir şerm bû, û kêmasiyek mezin bû, himber wê rewşa çewt û xerab û kevneperest, şahî û govend û dîlan li gundan digeriyan, keçan û xortan tolazî û tenazî û laqirdî bidizî bihev re dikirin, sazbend û tembûrvan, kemançvan, dahol û zirnevan, birûmet bûn, her celebên stiranvanan hebûn, qîzan xwe bihibriyên Mûsilî û Qutikên çoxê rengîn, bi kemerên zîvî û zêrên ber eniyê dixemilandin xortan kum û kolosên hevirmêş bi rîşiyên belek xwar dikirin, bejna xwe bi desmalên kejînî girêdidan, gulik û gulbend pêve berdidan, kîsê tûtinê pêve dadiliqandin, hinekan simbêlên xwe hine dikirin, gorê mûşanî dixistin piyên xwe de, hinekan çend tayên temberiya xwe di bin kum re derdixistin, xortan pesnê keça didan digotin: keça çav belek, bejin zirav, rû gewez, tu dibêjî gurciya Mûşê ye, zeriyek ji zeriyên mala Galo ye, qîzan pesnê xortan didan digotin: Ev xortê çeleng navmil pan, çepil dirêj, awirên wî nala yên şêra ne tu dibêjî kurê mîrê Palo ye .. yan ji pişta keleş Ebdî ye. xortan qîz direvandin xwe davêtin tor û bextê axa, yek caran axayên bext reş qîzik ji xort distandin û li xwe mardikirin, kê karîbû bêje kirp?

Institut kurde de Paris

revandin serbest bû, lê divabû hinkûfiî hebe ya, çîna qîz û xort yek bûya, gelek çîrok û çîvanok di wê rewşa axatiyê de çêbûn dinav axa xwe bixwe de, û dinav wan û gundiyan de.

Di wê demê de bêtirên axan kurê xwe bijin dikirin bêyî ku keç û xort hev bibînin, tenê mitirban û navmaliyan nûçe digerandin, û navbênçiyên yekemin ew bûn .

Lê ya giring ew bû ku bûk ji malmezina û axa be pirê caran bêtarin malwêran, dijminayî dikete nav du êlan bi sedema vê hovîtiyê, ango carekê axayekî qîza xwe ya spehî û delal pêş berbûwan kir, dûv re keça xwe ya bi çavekî di dewsa wê de şand, piştî guheztin û anîn mala zavê, ciwanmêr weke hemû zavan derbas bû koça pîrek û xêliyan, serûka wê hilanî, dît û tu ne bînî, çavek çewt û yê din weke xarek bîndoq, di cihê xwe de sist bû, çehrê wî reş xeriqî, laşê wî tevzînokan ew girtin, bizor lingê xwe bidûv xwe de kişandin, derket. Xêliyan bixwe kirin piste-pist, welê-welê kete nav wan kesên biyan fîskilandin, çepik û stiran û şahî qurquçîn, paşê deng biliya civata bûkê pijilî weke nokên tu berdî ser tehtê, bûk zîvirandin

Institut kurde de Paris

malbava sergêjî û berberî kete nav herdû axan, herdû êlan, bi sedan qehreman û mêrxas ji hev raxistin.

kurê axayekî dilket keça yekî gundî, qîzik pir rind û xweşik û rêzan bû, xortên gund bi piranî çav berda bûne wê lê keça delal û bîrewir dizanîbû ew ji kurê axê re nabe jin, bo vê yekê ewê guh lê nedikir, xortên gund ev nûçe li ber guhê diya wî xistin, xatûna gund dîn û har bû, bi kurê xwe de xeyidî jê re got: çawa te çavê xwe berdaye keça yekî kurmanc, û bi saloxan ew te hinkûfî xwe nabîne, binêr.. xwe ji vê gewendê, sêwîkê bê xwedîkê, vegir.. çêtire bavê te bibihîze wê te saqûçermî bike, te bê mirûs bike, tuwê dinav kurên axa û began de bi cerise, neçare kurê axê nikarîbû ji hezkirina qîza gundî ya çav zexel xwe riha bike, awirên wê xibşê tîrêjên xwe berdabûn hinavan û weke stiriyên serteşîkê di hinarkê ruwê kuré axê de çikilîbûn, sergiraniya keça gundî, bêtir sergêjek li dûndê axê civandin, û mejiyê wî çelqiya, tîna evînî ket xwîna wî, mixabin axayê sitemkar û hov ew gulistana evînê bixwînê avda ew kurê xwe girêda, bê yefş û hedan şandek birêkir çûn keça axayekî

Institut kurde de Paris

bixwazin, çawa evîndarê reben bihîst, xwe şewitand. xwe kir canbêzarê evînê.

* * *

Institut kurde de Paris

## BERANÊ BER KÊRÊ

Sê berik di goştê milê wî de razayî bûn, her mirovek himber wî zimanê xwe dirêj kiriba, destê wî digirt dikişand dibir ser cihê berikan û jê re digot: Bela kes pesnê xwe nede bilî min, ez bavê Quto me, beranê ber kêrê me, çênabe cengbaz weke min hebin, va ye te dît?.

Tiliya wî ya mezin firiya bû, mikur dihat, û digot: Leşkerekî cihû bi dûrbînê ez xistim nîşana tivingê, lê bi saya xwedê û şex Cibir ez ji mirinê riha bûm, û tiliya min bû qurban.

Gelek bermayên birînên biçûk li rû û destên wî hebûn, xwe bi wan payedar û pesindar dikir, çaxa bi rê ve diçû dengê xwe hildida, serê xwe bilind dikir, bi qapanî bi gundiyan re dipeyivî, û yek caran bi zimanê Erebî û Ingilîzî gotinin ji xwe berdidan, ji lewra ewî çend salan bi artêşa Ingilizan re kar kiribû, pişt re zîvirî welêt, çaxa vegeriya qîrîn û hewar û gazî li deverê belav bû, kete guhê wî, ku mêrxas û qehremanan dixwazin, bo herin qada Filistin şer bikin, wê ji destê



Institut kurde de Paris

Cihûwan rizgar bikin wan ji qada pîroz derînin.

Rabû ciwamêr, Hemo nemerdî nekir, têkilî bi leşker û artêşa azadiyê re kirin, beşdarî di şerê derdora Gola Teberiya de kir, ta ku bi deh ciyan birîndar bû, zîvirî hate gund li warê bav û kalan rûnişt.

Hemo yekemîn zilam bû kincên bajarî li xwe dikirin, ji gundiyan re digot ez li hespê hesinî siwar bûme, yekemîn merov bû mekîna qawina anî gund, çaxa derzî dadixist ser qawinê, qîjîn bi Kawîs Axa diket, stirana de loy loy axayê mino distira, gundiyên bêkar û tenbel hemû li Hemo diciviyan, û çaxa ku derziya mekînê dişikest, ewan gundiyan bazdidan diçûn, derzî û sûjin dianîn, Hemo bixwe bi qapanî dikeniya devê wî çarîkekê ji hev dima ji xwe re dikir piste-pist digot: de were li nav van hovan jiyana xwe bibûrîne...?.

Hemo karê bi serê qirşekî nedikir, gundiyan para wî bi ya mele û keye re kar dikirin jê re dişandin ber derî, Hemo gelek caran diçû bajarê Qamişlo li nik efendiyan û maldaran li çayxanê rûdinişt, yek caran canbazî û kosetî li hinek bazirgan û



Institut kurde de Paris

dukandarên hovik dikirin, ta dibêjin carekê xwe kire axa û zemîndar, pere ji yekî bajarî çilfisandin, dawî yê bajarî hat gund û pirsî .. kanî oda Mihemed axa ..? gundî kişmat bûn rabûn ew birin nik Keye, ewî yekûdû daxwaza efendî naskir bi destê wî girt ew bir ber tenûra gund, û jê re got: Efendî ev oda Mihemed axa ye ..? yê efendî pir ingirî, li xwe nexweş anî û gotinin bi hêrz û çewt ji xwe re gotin, ji keye re got: Hema Mimemed axa malê min bixwe jî ew ji we çêtir û zana tire, û li hantûra xwe swar bû vegeriya Qamişlo, pişta stûyê xwe xurand, gelekî poşman bû ji xwe re digot: Xuyaye wê demek bê gundî bajariyan bi xapînin ..? her êvar civata gund digeriya, wey li wî kesî be ku amade be berî Hemo dest bi çîroka şerê cihûyan li derdora Gola Teberiya bike, ewî gelek çîrokên efsûnî, direfşî digotin, pir caran dabaşa cewşenê dirêj û fireh dikir du şevan yan sê şevan, lê dabaşa xweş û şêrîn bi nêrîna guhdarên wî, şerê Gola teberya bû, Hemo pir li ser fen û fûtên cihûyan radiwestiya, çawa keçên wan yên çîm rût, paq spî êrîşî leşkerê me dikirin, û kêlîka li wan teng dibû, hinarên hesinî ji paşila xwe

Institut kurde de Paris

derdixistin û ew jî dihatin kuştin yan me ew dîl dikirin.

• yek ji civatê rabû kire bire-bir û got: carek din Hemo dest bi vira kir.. wê carê digot hespê hesinî hene.. vêga dibêje keç şer dikin û hinarên hesinî dipeqînin, çaxa dorpêç dibin.. de bese ev çi derew in tuwê bihêlî xaniyên me biser me û zarokên me de bikevin, civat berda û çû.

Hime-him, bi civatê ket yekî çaw- çawa wan birî û got: Hemo berdewam-ke gotinên te di serê me de dimeyin, xweş in û rast in, ew kerkerê ku çû ji gavantiyê pêv çi dizane..? gotina te bi şekir be, yekî ji Amûdê digot: keçên Cihûyan bi roj şerê me dikirin, û bi şev diketin himbêza Erebên Filistîn ew ji rê dibirin, xwe bidest wan ve berdidan, ew serxweş dikirin, senedên firotina xakê bi wan muhr dikirin, yekî din ji civatê rabû çit sekinî û got: bi namûs tu û Hemo herdû rast dibêjin ji ber ku xalê min wa ye zindî ye ne miriye li Serê kaniyê dijî ew dibêje: piraniya artêşa ku şer dikirin bo azakirina Filistîn Kurd û Çerkes û Erebên Sûrî bûn, û serok leşerê me jî Kurd bû, ji vê deverê bû, navê wî Fewzî Silo bû. Xortekî çend salan feqetî li Amûdê

Institut kurde de Paris

xwendibû, rabû ser piya sûnda asê û bê bexşîn xwend û got: Feqe Şêxmûs (cegerxwîn) bi zimanekî tûj û dirêj pêşberî seyda û Feqan digot: Dema Selahedldîn van Filistîniyan xinizî ji xaçparêzan re dikirin.

yekî evîndarê çiroka şer û qewxê, kire qîrîn siqêf kirin wî kesê ji vir û pêve çêlên Hemo bibire, ev çi quretî ne.. ji me re çiye .. çi gereke .. em zanibin kî xakfiroşe kî xinize?!.. bihêlin em ji xwe re li nûçeyên mêrxas û lehengan guhdarî bikin.

Carek din Hemo raser çêla şerê Gola Teberiya dihat, qada şer dikir dojeh, bê jimar laşê mirovan diavêt ji masiyan re, geh dikir qebe-qeb nav di xwe de hildida, radibû ser piyan, bi hêrz pesnê lehengên Kurdan bilind dikir, lê dema vê dawiyê, hinekî bi miletperweriyê hay bibû, ewî keserên kûr û bi tîn berdidan û digot: Ez çi bikim me ev keda xwe û canbêzariya xwe diber hinekan de winda kir, ku ne xurdê qenciyê ne .. ez bi tirsim dawî bibe xerabî, me ava gola Teberiya bi xwîna xwe sor kir, û va ye ji me re dibêjin, hûn bê nijad in ne milet in. Demek dirêj Hemo dikir bare bar kef bi devê wî diket, germ dibû sor û reş dibû, her ewî

digot; hûnê li van çîrokên min poşman bibin, ew kesê bimîne zindî wê van gotinên min bîne bîra xwe, lê çaxa Hemo bîna xwe berdida, sar dibû, qada şer dikir bihişt, pesnê çiyayê Şêx, berfa salweqat, kaniyên zelal, qîzên paq rût, çawa bi wan re dikeniyan, dixwestin me bixapînin, ewî digot: Raste ((şeqamêd qîza weke qinê gwîza )).. lê kuştina bi destê wê bênamûsî ye .

Sal di nav salan de winda bûn, felekê çerxa xwe nû kir, sinc û bawerî, têkilî û danûstandin serûbin bûn, Hemo pîr û kefte bû, guhê wî giran bû, civata odan pejilî, bû wêneyek bi dîwarên mejiyê kal û pîran ve hat daleqandin, civatên xortan û xwendevanan weke komikên ceh û genim şîn û berz bûn, li kolanan li ser bêderan, her roj bi gengeşê bi hevpeyvînê daqlîçî hev dibûn, navê Stalîn û Lînîn hate holê, kete her malê, sra bayê biharê ev nav bilind kirin, danîn ser milê xwe, ew li deşt û çiya gerandin, şalûl û bilbilên Kurdan li ber çem û çîmenan li nav daristan û gulistanan xwendin, stiranvan û sazbendan bi sedan ev nav xistin koda tembûra xwe, awazên celb-celeb û tîvel ji wan re danîn, ziman tûjan, kesên qure qube

Institut kurde de Paris

dengan bi şev û roj ban-dikirin : Ev in bavê miletan ev in maf parêzên merovan, ev in yên wê Filistîn aza bikin ev in yên wê her gelî rizgar bikin, ev in yên wê qadê ji zemîndaran bistînin û li cotkaran belav bikin, wê hevpariyê bi kar bînin, ev in rêberên bindestan.

Çawa van Kurdên nezan û ne xwende bi kerb û kelgermî xebat dikirin. ewan carek din digotin Stalîn bavê me ye, xap û rîpên Kemal ji bîr kirin û nizanîbûn, ku Stalîn (Kurdistana sor) herifand û kesên wê avêtin Sîbîrya û Corciya .. h.d, nizanîbûn ku Stalîn komara Mehabad herifand, fîrot bi petrola Qezwînê.

Hemo bê kêr bibû, bê rûmet bibû, nema kes li dorê diciviya, çîrok û serpêhatî bi kalan re ketin gorê, di mejiyê pîrên weke Hemo de razan, radiyo hatin gund, neçare Hemo her ku çav çend kesan diket xwe li wan digirt, pêjna xortan dikir xwe biser wan de pelû dikir ji wan pirsî anûha ji min re nabêjin ev Stalîn û Lînîn wê ji me re çibikin...?.

yekî dilê wî nehişt jê re got: xalê Hemo wê Filistîn rizgar bikin, wê Firensawî ji Cezair derînin, wê xakê ji me re ji zemîndaran

bistînin, wê wekheviyê û hevpariyê bixin nav miletan, wê mafê gelan biparêzin, wê hemî gelên Cîhanê bi azadiya xwe şabibin .

Hemo ji yê xort pirsî : ma gelo çêla kurdan û mafê wan nakin..? yê xort bersiva wî da: xalê Hemo piştî ev welat hemû bikevin rêza komenistan, wê çaxê cudayetî namîne, wê her gel bigihîje armanca xwe, her we yên berê tiştek ji me re nekir ?.

Hemo keserek dilşewat û kûr berda û jê re got: kurê min, me û kale pîrên xwe kar ji dijmin re dikir û yê ku ne karkirê mala xwe be, nabe şêrînê ber dilê xelkê, xebat û karê me bê sûde bû, xelkê ser pişta me impîratorî damezrandin, û em dibin simên hespên wan de man, lê ez bi tirs im ku nifşê we jî xortaniya xwe û zanebûna xwe di ber xelkê de bibûrînin, dawî ji we re bibêjin: hûn nijad-perest in, hûn hevalêd impiryalismê ne, yan ji we re bibêjin : Bîna xwe fireh bikin ta em cîhanê û gelên wê hemûyan bikin komenîst dûvre emê mafê we bidin we, ( kero nemir ta qîvar şîn bibe ).

Hemo kefte bû, nema dikarî bû ji hundir û ber dîwarê xwe dûr here, her çend rojan

Institut kurde de Paris

biraziyê wî serek lêdida, jê re bûyer nûçeyên nû û digotin.

Hemo pir kêfxweş û dilşad bû, gava di bihîst, ku xortin rabûne doza serxwebûna Kurdan dikin, dibêjin em jî miletek bindest in, xaka me dagirkirî ye, weke Cezair û Filistîn û Vêtnam, roj bi roj milet xwe li dor van xortan dide hev, Hemo ji biraziyê xwe re digot: bese koletî û navmalî, bese xapandin, eve hezar û hinek sal, ku em koletiya misilmanan dikin, dawî ewan welatê me li hev parkirin, ji me re dibêjin em birayê hev in di olê de, û ne gerek hûn bi vî zimanê çewt û xwar bipeyivin.

Piştî Hemo bi dilovaiya Xwedê şabû, gelek şer di navbera Ereb û cihûyan de hatin li darxistin, carek din bi sedan qehremanên Kurdan xwe berdidan nava şer, bi zikreşî û tundî diketin cengê, bi sedan pakrewan û canbêzar ketin, di Keleha Şiqêf de, di çiyayê Şêx de, di bajarê Qinêtra de hatin kûştin, hatin sotin, ewan digotin: eve cenga pîroz, dijî dagirkerên Sihyûniyan û impiryalizmê.

Çawa Cezair rizgar bû, serfiraz bû, serok û lîderên cezair, kurd û şoreşgêrên wan xistin rêza dijmin, cudaxwazan, alîkariya Sedamê



Institut Kurde de Paris

şofenî û hov kirin, dawî ew û şahê Îranê li hev anîn, li paytexta xwe peymana aşitiyê dinav wan de danîn, ji sedam re gotin: De here destê te ji te re van kurdên bê xak, bê ol, biperçiqîn, wan qir bik.

Sedamê devbixwîn Kurd koçebir kirin, ji cihê bav û kalên wan rakirin, derxistin bi sed hezaran winda kirin, binax kirin, dawî kela dilê wî hênik nebû, rabû dermanê qirkirinê yê kîmyayî avêt gund û bajarên kurdan, lawir û merov, zarok û pîr, xort û qîz hemû sotin xeniqandin, devera bajarê Heleçe û xurmal wêran kirin, gosirmeta ku li wê deverê çêbû, dîrokvan mane kişmatî, çawa pesnê wê bidin, dabaşa wê binivîsin, ev bûyera kesnedî û malmîrat, devlok û evorên serê çiya, ziyayên maran ji ber fihêt dikirin, laşê qîzên gulî sor, û xortên çalak li her qadê û kolanê raxistî bûn, nire nira kal û pîran bû, keziyên xaniman, hiriya mihan li qozîk û çolan bû, diyên bê hêz zarokên nîvmirî li ser milên wan bûn, xwîna kurdan li her deverê rijyabû, di wê demê de hevalin Stalîn digotin: Sedam ne şofenî ye ..!.

Ne Sedam kîmya avête kurdan ..! tewir û ya hîn kişmat û çeloxwarî .. ku serokê

Institut kurde de Paris

Filistin piştî bumbebaranê bi du rojan çû Baxda ciwamêro Sedam ramûsa, karê wî pîroz kir û navê wî kir seyf Elereb (şûrê ereban ).û jê re got: te qenc û xweş kir bi van kurdên ku xwe ji me bêtir dikin ereb û misilman, geh şerê xaçparêzan dikin,geh şerê cihûwan dikin, geh şerê impiryalizmê dikin.... .

Institut kurde de Paris

# GIR NEWAS

Sed carî me ji we re got: Vê qîzikê vê evdalê bibin ziyareta Gir Newas,bajarê Mîrê Cina,li wir ((Qidka Qidîşkê)) bidin mendalan, jiber nexweşiya vê rebenê bayê Cina ye,derman jê re tune ye,bilî hûn xwe bavêjin tor û bextê Mîrê Cina, derman jê re tune ye,ez çi bikim te û mêrê xwe bi ya me nekir,we xwe peritand, we xwe zelût kir,we gepa devê xwe û zarokêd xwe xiste devê Textoran, pez û dewar çûn,qaz û mirîşk neman, û ji xwe berê mişarek axa we li vî gundî tune ye, tewrê bi ser de min bihîstiye,Textor dibêjin; wê rakin bibin Şamê, dermanê wê li vir tune ye,û Textorê nexewşiya pûçbûnê li Şamê hene.Vêca ev ji we kême, de hema qenc û xweş bi te û mêrê te hat,Menco dabaşa nexewşiya qîzê kuta kir,herdû destên xwe li hev xistin, pêre rondikin bi gulolîk barandin, xwe kelogirî kir, kire weh weh,dûv re hedinî û bînekê sar bû.

Şemsa ji Menco re got:Keçê ! qiramê, por kurê tu xurifî ye.Tu ne li vê dunyayê ye..? Gir Newas li kû ye...?



Institut kurde de Paris

Em li kû ne..?Ma (Turko) dihêle em biçin ser ziyareta Gir Newas,mane sînor têl kirîne, davikên mirinê vedane, singoyan di zikê mirovan de diçikînin, dibêjin hûn gawir oxlî gawirin, dûv re ewqas pere me danîn,ewqas êş û kul me bi qîzê re dîtin,hemû nayên ber çavên me, em bi ferman û kiryarên Xwedê razî ne,lê ya kişmat eve ku ev çend rojên dawî Xelo qirik-tal bûye, kufe-kufa wî ye hema dike bipeqe, reben diçe bajêr û tê, dixwaze vê pepûkê vê pûçê bibe Şamê, vêca jê re dibêjin; tu ecnebî ye, çênabe tu herî Şamê,ji lewre tu nikarî li otêlan binivisî, û nexewşxane keça te derman nakin, çimkî bê nifûs e..!

Menco ziq li çehrê Şemsa nerî,destên xwe li ber devê xwe danîn û got, pepûk! Şemsa ecnebî çiye.!?

Keçê ev ne (Hala zer) be..yan (êşa zirav) be..? Hema bi Xwedê ez dibêjim; ev nexweşî ji bîna gaz û mazotê çêbûye..?

Şemsa lê vegerand û got:Na bêxwediyê ecnebî ji êşan xerabtir e, dibêjin hûn bêxwedî ne, kes nizane reha we, nijadê we ji kîjan deverê ye..? Û dibêjin ev welat ne cih û warê we ye ..?!

Institut kurde de Paris

Menco keserek dirêj û kûr berda û got: Erê felekê erê dunyayê,em bêwarin, kes nizane bezê bin guhê bav û kalên me ji kûye..? De bi Xwedê û Mazilebdîn, diya min neviya axê Çavsor bû,ewê digot: Deh cotên ga û dehên qantiran ji kalikê min re cot dikirin, ewî berhemên sê gundan li beriya Mêrdînê dixwar, lê mexabin kurekî xwe nekir qayimqam,wê îro bikêr me bihata,xeber ya wane,em bêxwedî ne,û ji berê de Kurdan gotiye: ((Şêr li Zozan dike zorîn,li beriya Mêrdînê gur berxan berdide)). Bi Xwedê em bê hişin, diya min digot: Kalikê min sê kurêd wî hebûn.

Kurek şand feqetiyê ew bû mela,û yek çû bajaran bû serserî,û yek di şerê berberiyê de hate kuştin,rabû ewî ji kerb û derdan perê xwe xistin mala Xwedê,mizgeftek avakir,û bi hezaran wekî wî hebûn,keda xwe û xêr û bêra xwe dixistin devê şêx û melan û berdevkê Sultan de.

Şemsa ji Menco re got: Tu yek caran wekî (Behlûle), lê vêcarê tu wekî komenîstan peyivî, gotinên te rast in, û ji xwe bavê zarokan ji qayimqam re got:

Heger em wekehev Islamin divê em di her tiştî de wekhev bin,û heger em gawirin me bişînin nav gawiran, jê re got: Em di vî welatî de hevparin, divê hûn weke şûrê Eliyê şêr dijî xwariyê û sitemkariyê bin.

Xelo tu rêçik û hawa jê re neman,bê hêvî bû buhayê dermanê Hêvî pêre nema,şût û rût bû perî bi baskan ve neman, nenûk kobûn, nema dikaribû xwe bixurîne, neçare Xelo ji gund barkir xwe avêt perê bajarê Qamişlo destê xwe avêt her karî,weke piling ket nav karkiran bê qapanî û fihêd xebitî, kincên quretiyê û gundîtiyê ji xwe avêtin.

Çavên Xelo ji karê wî nedişikest birûmet û sincên nerm têkilî û hevaltî bi mirovan re datanîn.

Bi vê riya rast û hişê paqij zû bi zû xwîn bi Xelo ve hat,geşbû ,rewşa wî ya abûrî xweş bû,berî ku xaniyekî ji kufletê xwe re bikire, yan cil û firaxên bajarî yên tîtikî ji kuflet re bistîne,ewî du lingên dezgeyî û gopalek ji Hêvî re çêkirin, kincên kesk û sor lêkirin,bi xwarin û tametîtkên bajarî ew xwedî kirin Hêvî mezin bû,gewr bû,porê zerî zêrîn xwe berdan ser milan û kulîmekan, sîng paxil bilind bûn,li devê derî radiwestiya li

Institut kurde de Paris

mendalan temaşe dikir çawa bi (Xêzê) dileyistin li gasînê bi gogê dileyistin, derdên wê yên giran ew bû çaxa didît keç û xortan lingê xwe bi tihêla pîkaban de berdidin, diçûn govendê, yan cejna Newrozê,kulên wê tev radibûn ,gava dengê xortan diket guhê wê, digotin; ev reben keça şeht, çi delale, çi şêrîn e..? wê çawa mêr bikê, wê çawa zarokan bînê, mejiyê wê lihev diket çawa hinekan deng dibirin guhê wê digotin: Hema xwezî ev keçik tuneba ma ne gunehe Xwedê ew hewqas spehî çêkir û piştre ew şeht kir.

Zimîn û gumîn dikete guhê wê dilê wê, dihate guvaştin,perwaz dida,çehrê wê tirş û tal dibû, çaxa qîzên xemilandî zîq-zîqa qunderên wan di bere dibûrîn, yek caran tenazî pêdikirin,çavên Hêvî yên reş û belek tijî histir dibûn, bi roj seraser li ber deriyê xwe radiwestiya,hinekî dikete kolanê,çitik çitik bi rê ve diçû, Hêvî digeriya, şîn dibû,reş dibû, sor dibû,geh sixêf dikirin,geh zimanê xwe ji xortan re bel dikir,geh tuf dikire xakê,û piştre li asîmana dinêrî,dikire pine-pin dikire nûzenûz.

Roja cejna Newrozê,21ê Avdara bixwîn û kul û derd, sibehek bi nem, çavên xwe

Institut kurde de Paris

vekir,tavikek awir qut, tîrêjin melûl berdan nav kolanên bajarê Qamişlo, asîmenek ebrû şil,bask sor û zer, bê dengiyek kûr li jorê ber perê asîman hebû, lê li ser rûyê qadê û di nav kolan û xaniyan de. Dengê qîz û xortan wîre-wîra zarokan, xire-xira makîne û motoran xweş bilind dibû, hêdî-hêdî tevlî bêdengiya razayî dibû, her û her tevger û libat fireh dibû, çûn û hatin sivik dibû, her kesekî cil û kincên rengîn li xwe dikirin, xwe amadeyî derketina biharê, çûna cejna Newrozê dikirin.

Hêvî xemla Newrozê wergirtibû xwe, dev li ken bû,dilgeş bû,çav û ebrûyên kildayî di nav serê wê de dileyistin, derveyî derî rawestiyabû, bendewarê-çûna biharê-govend û sema Newrozê bû,li qîz û xortan temaşa dikir, ji wan dipirsî: Gelo vê salê wê çiqasî xweş be!, wê kîjan sitranvan amade bibe, wê kîjan sazkar ji me re govendê rake, ew digirtin, kinc û xemla xwe pêş wan dikir, diket nava kolanê diçû milê rastê,dihat milê çepê,nema dizanîbû ew şeht e,lingê wê pûçin.Mixabin çawa xortekî serberdayî makîne bi xurt û lez dajot Hêvî xiste nav lingên makînê û ew bire govenda Mem û Zînê .

Institut kurde de Paris

# "YEWEL YA KURDÎ"

Êlên koçer xwedî pez û sewal çi ereb çi Kurd tev evîndarê helawê(rîçalê) ne.

Di hêla Cezîrê de,bi taybetî devera parêzgeha Hesiça,êla Koçeran bo vê yekê bi nav û deng in.Helaw li nik wan bi rûmet û giranbuha ye.Sedem ewe ku şêranî di nav êlên Kurdan û ereban de kêm bû, ew her dem li ger bûn, war-guher bûn,nikarîbûn mêşa hinguv xweyî bikin,sedema hiskirina helawê jî ew bû koçeran her roj qatix dixwarin,mast û şîr, dew û nîvişk, penêr û firo, goştê berxan, van xwarinan dihiştin çila Koçeran degel û gur bibe, girêza wan biherike bal helawê de.

Gelek çîrok û çîvanok di biwara helawê de hatin gotin,ketin ser zimanan gelek cire û bûyer û tevlihevî ji bo helawê ketine nav mirovan, emê di vê çîroka xwe de hinek bûyer û wêneyên bi tenazî ji we re bibêjin.

Dibêjin çend mirovên koçer ketin kirê hev, cire di nav wan de çêbû di biwara çi tişt pir ecêbe di vê gerdûnê de,yekî got: Ev balafir pir kişamat û ecêbe,çawa ji hesine û

Institut kurde de Paris

difire..?Yê din got:Hema bi Xwedê ev radyo ecêbe çawa qîzik li Bexdayê distirînin û li camcamkan dixin û dengê wan digihêne vira..?Yê siyem got:Hema bi pêxemberan ya matmayî û ecêb ew e ku Ilyaso dikana wî tijî helaw e û jê naxwe..!

Gelek bûyer û serêşan ji bo helawê di vê deverê de çêbûn,şivanek ji boyî comek helaw şivanê êlek din kuşt,herdû êl ketin navhev deh mêr ji hev kuştin, yekî bi tenekak helaw jinek spehî weke xezalekê bedew ji xwe re anî ,yekî bi qutîk helaw çar hox ji xaka gundekî kirîn yekî ji yê din re digot:

Xweziya min bi dilê te tuwê herî bajarê Mêrdînê nanê sûkê û helawê bixwî, û wê çawa mirina te hebî..?

Helaw di nav Ereban de bêtir pesindar bû,bêtir bi rûmet bû,ji lewre Ereb hemû koçer bûn, xwedî sewal bûn,ta ku hinek helbestvanên wan yên gelêrî sirûd di pesnê helawê de nivîsîne û stirane,yekî gotiye: Diya min heger ez bimrim,min bi "qemerdînê" bipêçin(bastêqa Mişmişa ye) û min di girek helaw de veşêrin....

Institut kurde de Paris

Ji ber ku êlên Ereban hemû di konan de dijîn,çaxa dewleta Ereban çêbû, ciwanmêran xwestin xaniyan û qesran ava bikin,kedî bajartiyê bibin, bo vê yekê bi sedan ostayên Kurdan diçûn hêla Ereban xanî avadikirin.

Ostayekî Kurd hebû pir zîrek û zana bû, navê wî Şêxo bû,çi devra dûr û bi tirs,ew di wir de bû,rojekê di civatê de dabaşa helawê firehbû,dirêj bû qur qur bilind bû,her yekî dixwest çîroka xwe berî yê din bibêje, rabû Şêxo ji wan re got: Da bihêlin ez ji we re çîrokekî bibêjim, da qina hûn guftûgoya xwe bes bikin, û jixwe re bikevin mijarek din, Şêxo dest pêkir û got:

Çaxê ku bajarê Şedadê nû kirin Nahiye, parêzgeha Hesîça gelek osta û demandar civandin bo avakirina xaniyekî ji mudûrê Nahiyê re û nivîsgeha wî re, gelek kes amade bûn,lê dawî pişka min li çûna Şedadê ket, ew kar bû para min.

Şedadê qunaxa 50k.m başûrî bajarê Hesîça ye min pir tika ji çend karkirên Kurd kir, ku bi min re herin Şedadê ,kesî xwe neda ber, rabûm ez bi tena xwe çûm ,min bazara xwe bi Mudûr re zelal kir, neçare min çend karkirên Ereb peyda kirin,çend rojan bi

Institut kurde de Paris

qurban bi heyran bi berger min û wan li berhev dan,me tu xebat nekir,tu ber ji ber me neçû,tu keda bi sûde me bi cih nanî, rabûm ez vegerîm bajarê Hesîça ,şevekê min zarokên xwe dîtin, roja din min tenekak helaw kirî û min berê xwe da Şedadê.

Çawa karkiran helaw xwarin li ber destên min bûn weke zîzok,ez kelpîçekî dixwazim ew diduyan didin min,wisa bi saya helawê min kar û barê xwe qedand, min karkirên xwe civandin kira wan da ye wan,min ji wan re got: Karê me kuta bû,mala we ava ,keda we li we xweş helal be, min bibûrînin, vêca ezê herim li min helal bikin.

Yekî ji karkiran ji min re got:Osta dibêjin helaw di zindanê de heye.. raste..? Min dest bi dest ya dilê wî naskir, bersiva wî da û min got: Lê kurê min raste û her roj sê danan didin mirov..

Yê karkir ji min re got:Mirov çawa diçe zindanê? min jê re got:Miha cîranê xwe bidiz,heger bi te hay bûn tu dîtin , kulingekî li serê yekî ji wan xe,piştre wê Derek bêne te bigrin,bibin bajon zindanê.

Institut kurde de Paris

Min ev gengeşe bi yê karkir re bi tenazî kuta kir,min ev rêçik da ber evîndarê helawê, û vegeriyam mala xwe.

Piştî mehekê ez hatim Şedadê,hinek pîne,hinek pere, bermayin tekuzkirinê mabûn, ez çawa derbas bûm nik Mudûr min dît ku Mudûr wî xortê karkir evîndarê helawê mihakeme dike.

Mudûr jê re got:Te Miha cîranê xwe dizî ye ..?

Ewî bersiv da û got:Lê sîdî min dizî ye . Mudûr jê re got:Te daqmoq li serê wî xistî..?Ewî got:Lê sîdî..raste min lêxist , beriya ku Mudûr pênûsê li kaxezê bixe, min bi destê Mudûr girt û çîroka yê diz ji serî ta binî jê re got: Ta bi derziyê vekir ,çawa min çîrok got:Mudûr zik û pişt qulipî ji ken,histiran di çavên wî re avêtin,rabû ji Derekan re got: Vî hovî vî evîndarî berdin ji bo bi helawê şa nebe,yê diz her tişt bihîst û dît.

Gava derkan kelepçe ji destên wî derxistin,ewî nemerdî nekir herdû tiliyên xwe anîn ber çavên min û ji min re got: Yewel ya Kurdî.. Yewel welah ezbehek(ya

Institut kurde de Paris

Kurdî ezê te serjêkim)te çawa destên min ji helawê birî,te ez dûrî helawê kirim,Xwedê te dûrî êla te bike.

Xalek: Dûr êl ketin li nik Ereban pir zore.

Institut kurde de Paris

# BABA DERWÊŞ

*Kurd dibêjin:"Giya dibin keviran de namîne".*

Temenê Mîrzo çar sal bûn,û yê Qasim sê sal bûn, çaxa ku Zehra xatûn herdû kurmik xistin xurcika kerê boz,û bi taryana sibehê re xwe ji keleha jêrî berda serberjêr bû başûrê bi xêr û bêr.

Salo yê navmalî bixwe ji talan û kuştinê zindî mabû,lê mixabin kal û pîr bibû,heriji bû, bê hêz bibû, ji dest xwe çûyîbû,di hundirê xwe de diçiqçiqî ji ber ku nikarîbû alîkariya Zehra xatûn bike.

Tenê jê re got:Divê tu xwe bigihîne gundê Ismaîl beg, bereka Mihelmiya ew û Salim axa destbira bûn,pirê caran Salim axa barê wî rast dikir,daxwazên wî di qedandin, ewê karibe van sêwiyan biparêze, dûvre nebî..nebî xatûn tu serûka xwe hilînî..? De here destê pîr Kemal li pişta te bî,dibin siya baskên ocaxan de bî.

Çiyayên hêla Heskîfê û ta bajarê Nisêbînê ne awqasî bilind û asê ne, bê daristan in,hinek wan çiyan binav dikin dibêjin:



Institut kurde de Paris

Çiyayên Berûwan,lewra darên berûwan li deverê hene ,bilî rezên tirî yên bi nav û deng,devera Mihelamiya û Omeriya ava ye.Lê wê demê welat hemû dubendî û berberî bû.Keleşî û talankirin û kuştin ne qedexe bûn,serê mirovan bi nan û pîvazekê bû,tenê ya baş ew bû ku çetan, keleşan qereçî mitirb û rêwiyên xîzan bi taybetî pîrek tazî û talan ne dikirin.

Zehra xatûn dernexûmî gundê Ismaîl beg bû,dît ku çawa dixan û agir li her taxê hilor bûye,xasme di qûntara çiyê de, Zehra xatûn hinek saw girt, ji xwe re got: Ma gelo ev gund dişewite..?

Her nêzîkayî li gund kir dît ku qesir û qûnaxên belek ji dûmanê Cuda dibin, tîrêjin rojê, bi melûlî xwe spartine pesarên hawêrî gund,nemaze qesra belek, rojê bi xeyd pişta xwe daye gundê mîrekan, xemgîn ber bi zerikê de bi giranî dadikeve, ew jî wek çiya û rezan û deştan û gundiyan qirik tal bûye, sergêjek li wan geryaye kişmatî mane, çawa Ismaîl beg barkiriye ketiye nav karwanê dilovaniya Xwedê.

Gundê Ismaîl beg li pesarê du çiyan raxistiye,çemek av zelal di nav herdû taxên

Institut kurde de Paris

gund re derbas dibe,rûniştvanên gund bendavek ji keviran li ser coga wî çêkirine bo pîrek cil û hirî û qir û qafên xwe li wir bişon,neçare Zehra xatûn xwe li pîrekan girt,herdû zarokên xwe riha kirin, ji xwe re bi avê leyistin ,bînekê ketin nav zarokên gund,bi wan re şabûn, Zehra xatûn kişmatî bû, damarên pîrekiyê di laşê wê de stûr bûn,çawa ew pîrek û qîzên spehî û gewr dîtin,hemû xemilandî bi hibriyên Mûsilî,pelikên zîv û zêr li dor eniya wan, xirxirk û gulikan xwe binav milên wan de berdane,hinek dikenin,hinek distirên hinek dikin qulte qult, bi zimanekî tîvel tevlihev dipeyivin hinek dibêjin welê ev jinika Qereçî bi serûke,xuyaye ne Qereçi ye ewê xwe reş girêdaya,helbet tiştek finasek ne qenc kiriye û ji ber bav û birayên xwe bazdaye.

Gava Zehra ev tan û niç bihîstin, rondikan bi lez xwe ji nav mijankan avêtin çehrê wê bû weke şimamoka reş û sor,pîrekek navûser bi vê bûyerê haybû, ew bixwe di biwara vê rêwiyê,vê qereçiyê ketibû gumana û taswasê,rabû çû dilê wê xweşkir jê re got:Xuşkê îro xêrdana Ismaîl begê ye,qey nesîbê van mendalan fireh e,de her mala pîra

Institut kurde de Paris

Fincê, ewê bixwe pezek serjêkiriye û pir evîndarê mêvana ye,û biher zimanî dizane.

Fincê pîrebiya çawîşekî Kurd bû.Di serê kevirê Biqul de hate kuştin,dûnde jê neman, ewê jî wek şûyê xwe sêziman bû, zêrek û zana bû,gelek caran Ismaîl beg nêrînên wê dixistin serê xwe ,di tengahiyê de Fincê çare û rêçik ji beg re ronî dikirin.

Çaxa ku Fincê mêvana xwe dît,her tişt li eniya wê xwend,çîroka wê ji serî ta binî di serê wê de meya,û bi dilovanî jê re got:Qereçiyê rebenê westayê,serûka xwe bavêje,gemar û teniya ser dêmên xwe û van berxikan bişo ,min naskir derdê te giran e,çiya dibşifîne, diherifîne.

Zehra xatûn wê şevê dilê xwe ji pîra Fincê re vekir û qolana zêran ji ser taziyê xwe vekir,li ber danî.Jê ra got:Tu diya minî û ez keça te me.

Zehra xatûn xwîn pêve hat,çehrê wê vebûn,roj bi roj xwe derbasî nav kerwanê xweşikan û nazliyan kir,nav û dengê rêzaniya wê,şahnaziya wê,li wê deverê belav bû,wek agirê ku li çilo here,pesnê spehîbûna keçama Fincê li ser zimana gêriya û nema

Institut kurde de Paris

tebat û hedana herdû bêkesan ji ber sewteriyên gundê bê serî nehat,rabû pîra cîhangîr kar û barê barkirinê kir,bi skomê qereçiyan bi saryana sibê re xwe berdan texma beriya Mêrdînê. Pîra Fincê ji Zehra xatûn re got:Emê herin Amûdê cih û warê sêwiyan û bê kesan û xwîniyan,Kurdên wê deverê bi rûmet û berêzin,xwendegeh li wir hene,qena ev herdû lawik li wir perwerde bibin,û zana û zîrek bibin, rojekê destê wan dar bigre, karibin vegerin tola bavê xwe hilênin.

Piştî çend rojan li nik mala xaleta bûrandin, Fincê hawêr Amûdê peland û tapkir,dawî xaniyek fireh kirî û navê xwe kir pîra Yadê mirîda şêxê ( ker boz), li ser eniya nexweşan xaçekî ji teniyê dinexşîne wan ji êşê riha dike,tuf dike devê lalan wan biziman dike,di guhê dînan de dixwîne wan bihiş û raman dike, avek linik wê heye pîrekan ducan dike, nav û dengê Yadê û tirsa ûçaxên wê di hiş û sewdanê kesên wê deverê de şînhat ta hinekan digot:Yadê miriya zindî dike,nemaze çawa dîtin “Gurciyek Mûşê” navmaliya wê ye,ew bixwe ji bayê Cina riha



Institut kurde de Paris

kir,û hogirî Yadê bûye nema diwêre jê bidûr keve.

Yadê xanedan bû,zîv û zêr xistin kewaran,kîse berhev kirin ji Zehra xatûn re digotin:Ev quloçê mêran dişikînin,wê Mîrzo û Qasim bi saya van tola bavê xwe hilînin ev teraziya xurtiyê dadigerînin.

Mîrzo û Qasim weke taykê reyhanê ber bi jor de kişiyane,nû tayê simbêlan derbûne,qîzên Amûdê di qulika zîlana derî re li wan temaşe dikin,bi taybetî çaxa ku ji mizgeftê vedgerin,û ji hev re dibêjin,helbet bavê wan jî weke diya wan spehî bû,ji loma gava hate kuştin xanima wî li ser dîn bû.

Dabaşa bav û kalên Mîrzo û Qasim rojane bû,di mejiyê wan de reh berdabû hinga diya wan ji wan re dixwend, û pêre digiriya,her dem sawêra bûyera kuştina bavê wan li ber çavên wan bû,ewan rengê her mûyekî ji laşê bavê xwe zanîbûn çawa ye, dizanîbûn rojê çend caran qalûn dikêşa , zanîbûn hiz çi xwarinê dikir, çiqasî dirêj bû çiqasî navmil pan bû, çavreş bû, kê ew kuşt, li ku hate kuştin, ewan her şev karûbarê çûna jor dikirin tep û rîp bi hev re şîrove dikirin,pirsa rê ji diya xwe dikirin, wê bi çi rewşê bi çi

şêweyî tola xwe hilînin û seroktiya bavê xwe vegerînin.

Bajarê Amûdê wê şevê mest û gêj bibû, bandora bîna giyayê endekoyê lêkiribû, Yadê û Zehra xatûn hişkeling ketibûn, di nav stiriyên xewnên ne xewş de vegvizîbûn.

Hinga wê şevê şiyar man,qolanên herdû çêlîşêran kespik dikirin,tijî zêr dikirin,pîra Yadê biqerf ji wan re digot: Ev qelenê we ye û ji bo xatirê sêwîbûna we Xwedê daye me,her ji we re ye,yê me lingek li dinê ye ,yek li gorê ye.

Mîrzo û Qasim piştî nîvê şevê ketin ser pişta du kerên Şamî û rehwan, xurc û zînkirî, her yek xiştek diber pişta wan de, her yek erbaneyek (defek) bi milê wan ve daleqandî, kumek kesk û sipî li serê wan,bûne du( Baba Derwêş) û bi çiyayê jorî ve hilkişiyan,berê xwe dan bakurê miradan û hêviyan.

Herdû Baba Derwêşan devera keleha jêrî li hev xistin neqeb û qozîk û car û newal û şikeft,qesra Salim axa ya kavil hemû pelandin û gavandin,kesên deverê mirovên xwe êla xwe hemû dane ber qelem teraşê zanîn û ramanên xwe, bi dengê xwe yê

Institut Kurde de Paris

dilovan û kovan û srûdên xwe yên bizimanê Erebî yên dilşewat, hiştin ew rûniştivanên wê berekê matmayî bimînim, ji hev re digotin:Gelo ev ne kurên Xocê Xidir bin,yan ji reha pêxember bin,ji lewra bi Erebî bi hev re gengeşê dikin,bo vê yekê ewan xelkan herdû Baba Derwêş ji dest hev digirtin, ji lewra kesên wê deverê digotin:Cihê ku ev seyid lê xewbikin, bixwin û vexwin, nexweşî û êşên giran jê bardikin,wisa nûçe û dabaşa van herdû derwêşan gihandin Saroxan axa,yê ku ev deh sale êşa zirav ew girtiye,û ahîn û nalînê ew kiriye hestî û çerm.

Saroxan axa xulamê xwe şand pey Baba Derwêşan bo şevekê bêne mêvan-dariya wî,çaxa xulamê Axê ev doz li herdû baba derwêşan kir,ewan bi kêf û dilxweşî qebûl kirin,Mîrzo ji Qasim re got:Birayê min vêca roja me hat,divê îro em pîlanên xwe bi cih bikin kinc û cilên parsê bavêjin,û seroktiya bavê xwe vegerînin.

Şev ker û lal bû,civata axê tarmarî bû, nire-nira Saroxan axa ye,di nav nivînan de, dike kûze-kûz, dike aye-ay,lavan dike, sixêfan di nav gotinên xwe re berdide, navê kurêd xwe tîne ziman, dijûnan ji heyamê û

Institut kurde de Paris

cîhanê re dike,bang xulam dike,her bînekê tiştek bê wate jê dixwaze,her û her di nav vê lebatê de vedigere ser derwêşan ji wan re dibêje:Ma ne raste.. ma ne weke gotina min e,ma gelo hûn ewqasî geriyane we mirovê wek min zana dîtine, lê ez çibkim vê mîrata êşê ez ji dar xistime, hindik maye merdalên gundiyan ji bin siya fermandariya min derkevin, heger we ev êşa giran ji laşê min derxist, we ez vegerandim,dema berê gewzeya xortaniyê, ezê we ji xwe re bikim kur ,her yekî zeviyekê û jinekê û xaniyekî jê re amade bikim.

Mîrzo ji axê re got:Ez bi serê ocaxên xwe sûnd dixum, ku sadatan û giyanên nûranî,û mîrekên Cina û koma pîrevokan, li vê odê bicivînim, ezê bihêlim ji te re govenda şahiyê bigerînin, vê êşa malwêran ji canê te bikişînin, wek tu muyekî ji mast bikşînî, Mîrzo ferman da xulam ku ew û Qasim herin ser dika odê,û bizimanê Erebî ji Qasim re got: Heger nebe dost bi xweşiyê.. wî tune bike bi zik reşiyê, û yê min ez dersa xwe xweş dizanim.

Mîrzo ji axê re xwend ,li erbanê xist, polik û qafik kirin rêz,hinek bîna biyan pê

Institut kurde de Paris

werkir,Saroxan axa sist bû heriji, çavên wî qulupîn,zîz bûn,bi melûlî lava û tika dike,axa her dibêje:Heger bi saya Xwedê û Ocaxan we ez riha kirim, ezê devê kewarêd zêran ji we re vekim.

Mîrzo ji amê stemkar re got:Axayê min bavê min Baba Derwêş bû,beriya sih salî dihate vê berekê,ewî beriya mirinê temînî li min kir ku bême vê deverê, Salim axa bibînim,ma gelo zindiye yan miriye, ta ez sûnd dame ku ez tola wî hilînim heger hinekan ew kuştibe,ji min re rast bêje kalo gunehkaro..? Axa ev çîrok hiskir qidûmên wî rehelîn , sawêran di mejiyê wî de bi çirê leyistin, çavên wî ziq û beloq bûn,serê xwe danî ponijî, dûvre serê xwe rakir û ji Şêxê mezin re got:Vêca te birîna min tev rakir, jixwe derd û êşa ku xwe berdaye canê min eve,xwezî şêxê min te li polikê xwe binêriya,du biraziyên min hebûn diya wan ew revandin, ez nizanim bi ku de birin..?Dûv re hersê kurêd min bikêr axatiyê nehatin,çûn Amedê nik rehbikan,ez çibikim ya min bixwe kir Xwedê neyne serê kesekî.

Mîrzo ji amê xwe re got:Hey bavo hey bavo! polik dibêje:Vane herdû biraziyên te

Institut kurde de Paris

dibin çengê te de ne! û hatine tola bavê xwe ji te hilînin,ma tu çi dibêjî? Çawa axa çavên xwe xistin çavê Mîrzo xwîna birayê wî Salim axa pijiqî ser çavên wî,dengê wî yê bi rûmet û bi gazin perda guhê wî hejand,çaxa ku jêre got: Birayê min çima tu wê zarokên min sêwî bihêlî..?

Saroxan axa keniya û giriya lerizî destên xwe vekirin ku Mîrzo ramîse,lê Mîrzo xincera Soranî kişand,

Amê wî jê re got: De hela bihêle ez xulam bişînim dûv keye û mele ,herdû keçamêd we li we mehr bikim,û mezinahiya welatê we bispêrim we dûv re min bikujin,û laşê min bavêjin ber segan.

Şahî û xweşî kete deverê,govend û sema li darketin,herdû kelehan serê xwe bilind kirin,naqul û axa û mezinên wê deverê hatin,meznahî li Mîrzo re pîroz kirin,bi çavekî mezin û hişmendiyê li Mîrzo nêrîn eferîn danê,bo kalê amê xwe nekuşt.

Piştî çend rojan Mîrzo axa çend siwar û hespên bê siwar şandin Amûdê lê mixabin hespê Yada Fincê vala bê siwar vegeriya.

Institut kurde de Paris

# XURCIKA CIHÛ

Di nav Kurdan de çi mirovê qutik û kinik bi qapan jê re dibêjin:Singilkê Qapanê,heger bejna wî çit be,birêveçûna wî wek ya began be,jê re dibêjin:Qula sing, yan dibêjin:Weke qurqur begê ye, heger zirtekî be,xeberok be,xeydok be, jê re dibêjin:Çi sîrqûnkî ye,û li gelek deverên din ji kesên wisa re dibêjin: Zirtikê pehlewan (Pehlewan berê hebû ewî mirovek hûrik û cansivik bixwe re li gundan digerand jê re piropagenda dikir, bang dikir zirt û fort dikirin,digot:Vaye pehlewan hat.. Wê li ser destê xwe bi rê de here,wê meşa dûpişka bike,wê li ser pişta hespê bileyize.. Rola xwe diqedand dirav ji gundiyan digirtin xwe çem dikir pişt ostayê xwe yê pehlewan û diçûn gundek din).

Hinek ji mirovan hebûn,çit bûn oflaz û bi qapan bûn,bê kar bûn,li gasîna gund dikirin fîke fîk ji wan re digot:Dîkê şinik yan çi weke dîkê şeki re.

Ehmedo li gundê Darînê hebû, çi pesnên mirovên qutik, hûrik, zirtik li bejna wî dihatin,û biserde jî digot:Ez ji malmezina

Institut kurde de Paris

me.Kes di vî gundî de nikare reha xwe bigihîne malbata maqûlê êlê bilî min.

Gundê Darînê tev xêr û bêr bûn, çavkaniyên hatina abûrî li gund pirr bûn, dexl û dan, pez û dewar, kewarên hinguv lê hebûn,bilî van hatinên xuristî Qaçaxçî gelek dihatin gund, tûtina Xursê, mewîj û bastêq û dimsa Omeriyan tanîn gund, bo vê yekê gundiyan gelek qencî bi Ehmedo û navmaliya wî ya kurdûnde dikirin,ji ber ku Ehmedo karê bi qasî qirşekî nedikir, bi roj dida tengala maqûlê gund,yan li kolanên gund dikire qebe-qeb, kumê xwe xwar dikir,yek caran ziman dirêjî dikirin, lê gundiyan lê nedigirtin digotin: Ehmedo mirovekî nîvco ye,bê dûnde ye,hinekan ew dibûrandin dikirin xatirê jina wî ya birûmet û rêzan,çaxa Ehmedo dihate malê xanima wî serê du hêkan li hev dixistin,bi rûnê malê diqelandin bi çehrekî şêrîn,devekî li ken,li ber malxwê xwe datanîn,lê mixabin ewî bizirt û fort sixêf û dijûn dikirin pepûka jinê,jê re digot:Dêl keça dêlan ev çi quzilqurt e,her roj tuwê ji min re bînî..?Ewê dibin çavan re lê meyze dikir,dengê xwe pêre dernedixist ji xwe re digot:Qey ev para min

Institut kurde de Paris

e Xwedê aniye serê min,gelek pîrekên gundiyan gazind ji xanima Ehmedo dikirin jê re digotin:Ehmedo çav dike me li dor me digere,yekê jêre got:Keçê ev mêrê te çi qula sing e,ez karim wî bikim nişûk bixim bêvila xwe,û ez napişkim,yekê din jê re got:Ez dikarim zilamê weke wî ji heriyê çêkim,ya din jê re got:Ev mêrê te wisa xwe tûtikî,belik dike,xwe di tiftifî ne,û qulûziyê li min dike,ma ewî çi alifê hespa xwe dagirtî ye ma ya cînara? ma ne yadê Xwedê nuhka dide yê bê diran , mane mixabin ku tu jina vî beytikê ser serguwa ye.

Bi hezarên caran deng û bas diketin guhên xanima Ehmedo,digotin:Heger vê jina rind û delal,ya weke hespek kihêl mêrek din kiriba, anuha wê birek kezî sor û xortên çavşîn bi dûv ketina.Bilî finasên bi roj ,û şalûziyên kolan û gasîna gund, ewî gelek tep û rîp bi şev jî dikirin, li oda maqûl şano û laqirdî û leyistik çê dikirin , gundî radikirin leyistika (xirê)ewî kesên li odê dikirin du bend pişta wan disipart dîwar,divê kes xwe ji dîwar bernede,û her bendek bixwaze ya din ji odê derxe,ewî ev leyistik binavdikir(xira ga).

Institut Kurde de Paris

Ehmedo kes qûnzuha bernedida, ta mêvanên biyan, ewî cilê qîzan li xortan werdigirtin dixemilandin ew diguhertin bi barek guwîz û mewîj, dawî zava digirt,dade dikir,dixist axurê dewaran, hinek dixapandin ji wan re digot: Min xiznayek zêran di gir de dîtiye,(xurcika cihû bi wan didizî)navê van tep û rîpan wê demê(xurçika cihû)bû

Carekê barê yê Xursî,barê tûtûnê jê stand, û barek axa zer weke zêr jê re dagirt,yê qaçaxçî bikêf axa zêrê derewîn barkir, piştî gihişt,û her tişt naskir,pir ingirî sor bû,bi hevalan re nûçe şandin,name şandin,doza buhayê barê xwe kir,û gelek guf li Ehmedo kirin ku wî bikuje,ta maqûl ew hajkir.

Ehmedo şevên çile leyistika hingulîskê digerand ,yek caran diçûn gundekî din, ser barek guwîz û mewîj dileyistin, yan li ser dîkên Elokan dileyistin, Ehmedo xwe dikir serok,ewî sûnda bi telaqan qedexe kir,sûndek nû di civata hingulîskê de bikar anî sûnda bi Şekalê.

Nav û dengê Ehmedo li wê deverê belav bû, maqûl û axa ew dixwestin, jê re dişandin ku deh taq li maqûlê wî teyaran û Hoxên xakê bidin wî jinekê jê re bînin,dibe Xwedê

warê wî şîn bike, her ewî gundê xwe êla xwe maqûlê xwe bernedida.

Feleka bê ol,gerdûna bêbext, mirovantiyê diguhere, xuristê diguhere,jiyan neçare serûbin dibe,ji.lewre tenazî û şahî û xweşiya gundê Darînê kete bin tekelên makîna,û ramanên nûjen ew daqurtandin, maqûl winda bûn, civat pijilîn, çîrok û laqirdiyên kevnar ketin nav dûmana reş,bînek nû tev li sira bayê sibehê bû,Ehmedo pişt şikestî bû,sitû xwar bû, jin çû,maqûl di qoqê gir de hat nixumandin odexana Ehmedo hate veguhestin, şevbuhêrka wî kete danê sibehê,nik Kevirê Birûskê,ewê li serê tingekî hatibû çandin, kevrê tawiyan û bawiyan,qelenê dermanê wî pîvazek û kulorek nan bû, ewî kevirê Birûskê gelek nan û pîvaz dixwarin, kêm caran hinek didan wan kevirên biçûk yên ku kozika wî bi wan hatibû avakirin.

Ehmedo pişt xûz bû,bi saya gopalekî ji dara guwîzê xwe digihand bedena gund ya kevnar,cih û warê kevirê birûskê û kalepîrên gund lê diciviyan, ji ber ku girê mezin nêzîk bû,himber civata Ehmedo ya nû bû,ewî gelek caran sûnda asê bi tirba maqûl sûnd

Institut kurde de Paris

dixwar,ji wan pîran re digot:Ma hûn ji min re nabêjin ev çi derek in û çi dibistan in..? Hema bi namûs mirov ji van derdekan ditirse bêtir ji cendirman.ji wan re digot:Ma ew Feqetiya ber melê ji van dibistanan ne çêtir bû?Ev gengeş e bû ev danberhev bû cire diket nav wan pîran, bo tiştên kevn û yên nû,bo xwendina dibistanê û ya Feqetiyê,hinekan digotin:Ka wê çawa ev rebenên zarokan hînî zimanê Erebî bibin,pepûkan her roj yê mamoste daran li destên wan dixe,yekî got:Yê mamoste wê rojê pêşberî min destên xwe li eniya xwe dixist,bibû niçe niça wî kişmatî bû digot:Çawa ev Abbas Quran xwendiye û dizane her pirtûka Erebî bixwîne û dizane her navî binivîse,lê çar gotinan bi Erebî nizane bipeyive,gava ku goga şagirtiyên dibistanê,ber bi kalepîran de dihat,ewan dijûn dikirin,bang dikirin, belqitîno ,hûn çi şûm bûne herin goga xwe dûr bibin.

Çaxa ku çavên herdû bestên Darînê derbûn xêr û bêr ji wan rijiya,her sal ewan bilehiyê re qûm û kevir ji çiyayê jorî diherikandin gund, vêca gundiyan bi tevayî karekî dijwar dikirin,êvarî dihatin mal

Institut kurde de Paris

hişkeling diketin,civat dixewnan de digerandin,xweşî û şahî qurqurçin,çawa gundiyan çavên xwe li danheva peran beq kirin, Ehmedo bêtir bê rûmet bû,bê guhdan bû,neçare terqiya serberjêr bû çû gundekî pismaman li berî Mêrdînê lê Ehmedo paşepê dimeşiya her û her li çiyayê jorî dinêrî,di nav xewnên xweş û bîranînên biroqankî û rewrewkên berî Mêrdînê de hate pêçan.

Institut kurde de Paris

# XELEFÊ GAVAN

*"Bira pişt e, kezeb xişt e jinemal her tişt e"*

Xelefê Gavan weke ku gundiyên Hewarê nav lê dikirin.. pir zana û şareza bû, ji lewre ew bixwe kurê maqûlekî bû, pîrekek gundiyên wan bêbextî lêkir, rabû bavê wî ew dûrêlî kir, penaberkir .

Neçare Xelef bû gavanê Hewarê, lê bê dengî jiyana xwe derbas dikir, tu caran çîroka xwe nedigot, her êvar digeriya, nanê gavantiyê dixist tûrikê xwe û dihat nav zarokên xwe mala Xelefê gavan weke dibistana sê ziman bû, jina wî Quran xwendi bû û bi zimanê Erebî xweş dipeyivî, ewê bixwe kurê xwe Elî hînî Quranê dikir, bavê Elî bixwe ew hînî nivîsandin û xwendina Turkî dikir, ji xwe zimanê Kurdî yê hevpeyvîna malê û taxê bû .

Nişmiyê pîreka Xelefê gavan ji êla mihelmiya bû, erê ji lingê xwe yê rastê seqet bû, dikulkulî, lê her harê pîrekî hebû di dest de weke hevirmêş bû, tevindar bû, teşîrês bû, nexişvan bû, nanpêj bû, dewkil bû, dims û

Institut kurde de Paris

bastêq û mewîjên ku wê çêdikirin bi nav û deng bûn, pîr û kalên gund digotin ev Nişmiya ji malbata mîra ye, bavikê wê milûk û sultanên vê deverê bûn, mixabin Turko ew qelandin.

Çawa Xelefê gavan garan derdixist çolê, Nişmiyê kar û barê zarokan di mal de bi cih dikir û xwe berdida kolanên gundê ava, karê pîrekên xandanan dikir, û têra xwe mêwe nîsk, nuhk tanîn, bi vî hawayî Xelef bi gavantiyê û Nişmiyê bi navmaliyê baş baş kîse girêdan, lê mixabin roj bi roj gundî û melayê gund çav reşî avêtin gavanê pepûk, gundiyan digotin: Em xwedî rez in û pez in û dexilûdan in û çawa mala gavên ji me çêtir dixun, kinc û cilên zarokên wan ji yê me nûtir in, melayê gund digot: Çima mala gavên zarokên xwe hînî quranê dikin û gundî hemû hay bûne ku zarokên gavên ji suxtê ber melê jîrtir in, bo vê yekê xelat û baca melê kêm dibû, xelkê bi qirik talî didan, ji lewre her ku mela suxte hînî sûretêkî ji Quranê dikirin bacek wî hebû, (Sûretê tebet, mela digot: bînin mirîşkek weke bet..?) (Elmaûnelmaûn, her yek bîne qalibek

sabûn..?) (Lî ismî rebîke fe hedis.. her yek bîne kodikek dims..?) .

Lê bîna vê zikreşiya gundiyan û melayê gund ji Xelefê gavan re, neketibû pozê Ibrahîm axa, her êvar civata wî digeriya dibû qebe-qeba wî, çi dihate ber devê wî digot, mela û pîso xulamê axê her digotin: erê binamûs wilo ye.. tu rast dibêjî,! Ibrahîm axa hovekî bê hawe bû, stemkar bû, sincgemar bû, bê tore bû, çaxa civata wî digeriya şivan û gavan li nav şekalan rodiniştin, eger yek ji wan bipeyiviya ew dicerisandin, bilî Xelefê gavan, çaxa dipeyivî axa lê guhdarî dikir û mela jê dipelikand Xelef bi rêzanî û konevanî û zimanekî xweş nêrîna xwe dida zanîn .

Kurekî Ibrahîm axa mezin hebû, tew tewe bû, weke dîkê şinik bû bêtore bû, li nav gund digeriya dikire fîke-fîk zincîra xwe li badikir, dest bi avêta qîza kê bav û bira newêrîbûn bêjin kirp,her kar jê re serbest bû.

Jina axê keça mirovekî bajarî bû, ji bermayê Xelîl begê Heskîfî bû, demek dirêj xizanî biserde hat, neçare malbatek din mîrektiya Heskîfê ji dest derxistin, Salîha Xatûn jinemêr bû, qayiş û berberiya Heskîfê

Institut kurde de Paris

ew hînî gelek dek û dolabên jiyanê kiribûn, ewê bixwe Ibrahîm axa radigirt, dijî stemkariya axê radiwestiya, gundiyan gelek birûmet xwe ji Salîha xatûn re datanîn .

Çar kurên axê hebûn û keçek bi tenê ji wan re çêbû, ji lewre keçik pir bi delalî rakirin, xilxalên zîvî dixistin lingê wê, gulik û xirxirk bi qutikê wê yê bi qeseb vedikirin, gulîkên wê dihûnan, guhê wê qulkirin guharekî zêr pêvekirin, jina melayê gund ew hînî Quranê dikir, çawa keçik guloxetkî bû hînî xwendinê bû, hevalan jê re digotin: Zarokên Xelefê gavan ji te çêtir dizanin bixwînin, ewê pir dixwest rojekê wan bibîne, bi wan re rûne, bo wilo doz li diya xwe dikir, ku herin mala Xelefê gavan, Salîha xatûn bangkir navmaliya xwe jê re got: Here jina gavên bîne qena çend doşek û mitêlan ji me re girêde. jina gavên bilez û bez hat û kulkulî, bi geşî û dev li ken hat cem xatûnê, Salîha xatûn jê re got: keçê kulekê gundî ji karê te û zanebûna te lal dibin, ev tu li kîjan deverê rabîye, ta ku hînî van karan bîye..? jina gavên bersiva wê da û got: Mala ku tû têde rabûye ne ji mala bavê min xurtire û

zanetir e û Êla bavê te ne ji Êla bavê min mestir e..!

Eger tu Xelîl begî ye..? ez Îsa begî me..? pişt re ewan hevûdû qelandin, ya min û te çi ye..? xatûn li gotinên jina gavên matmayî ma, ziq li nav çavên wê nêrî û got: keçê eger ne derew e çima te evê gavan kiriye..? ma sêwiyek ji mala we nema bû..? ewê bersiv da û got; na bixwedê ez sêwî bûm, xalê min ez xweyî kirim, dûvre min Xelef hînkûfî xwe dît, ji lewre ew jî weke min felek lê geriyaye ji Êla xwe penaber bûye..! dibêje ew bixwe ji mal mezina ye .

Ma xatûnê tu dizane malbata Ibrahîm axa kî bûn û çi dikirin..? xatûnê got: Kulekê bêje kî bûn, jina Xelefê gavan jê re got: Kal û pîrên gund hemû dizanin ku malbata Ibrahîm axa kurk çêdikirin, û hinek ji wan berber bûn û hinekan ji wan halet çêdirin, Xatûnê serê xwe danî pojinî, mejiyê wê li hevket, salên ku bi Ibrahîm axa re burand anîn bîra xwe, bawerî bi gotinên jina gavên anî, û keserên kûr û dirêj berdan, xatûnê gelek bîranîn di hişê xwe de gerandin, bi taybetî çaxa ku Ibrahîm axa sê zixur anîn û keye anî û mela anî, xwest ku wê berde, lê keye jê re got:

(Axa weke Selîm axa li xwe neke, ewî jina xwe berda sê telaqên wê avêtin, pişt re poşman bû, rabû Şêx jina wî li sofiyekî markir(cahiş ilqadîkir) û sofî jinik wê şevê revand û hîn diçe hîn diçe û ji derdê vê bûyera giran Selîm axa dîn bû. Ibrahîm axa ev bûyer bihîst biryara xwe daqurtand).

Ji wê demê de çûn û hatin, têkilî ketin nav xatûnê û jina gavên, çûn û hatin di nav wan de xurt bû, bi vî rengî demek xweşî û şahî bûrandin. Çinarê keça axê û Elî kurê gavên pêwendiyên girêk sist bi hev re danîn, lê roj bî roj têkiliyên wan fireh bûn aloz bûn, dilê wan li hev pirsî, awirên wan li hev diketin, bi hev re dişikestin, çaxa himber hev dihatin, hinarkên riwê Çinarê sor dibûn. eger mirov tepiskek lê bixista wê xwînê bigota pîj bipijiqanda..! Elî kurê gavên jî kêm caran sînorê mala xwe derbasdikir, lê Çinarê xwe bi serde pelû dikir, Elî kurê gavên tenik û dirêj rabibû, spehî bû, xwîşka wî dildigirtê, tayên sinbêlan nû lêvên wî belek kiribûn, Çinarê bixwe hinkûf û tayê Elî bû, lê ji Elî geştir bû, çav vekirîtir bû, dema himber hev rawestiyana, çavê Elî beriya yê wê dişikestin, roj bi roj şax û paxên evînê xwe

Institut kurde de Paris

berdan hinav û dilê herdû tayikan, qîz û xortên Hewarê beriya dê û bavan bi vê evîndariyê haybûn,dizanîbûn ku Çinarê Elo nade bi her çar birayên xwe, lê ka yê ceger bike, devê xwe veke, dabaşa vê hizkirinê bêje .

Êvarek payizî fîze fîza ba ye, nav taxê mişt qirş û qal bûye, xuşîn bi şaxên daran ketiye, qîje..qîj ketiye nav gund, her kes pez û dewarên xwe derbas dike koz û axuran, keviran datînin ser erzêlan qena li berba nerin, çi firax û cilên ser xaniyan û hewşê derbasdikin hundirê malê .

Xelefê gavan bixwe wê êvarê baş westabû, mejiyê wî li hevket, ta ku garan ajot nav taxê, û çawa gihişt malê bê deng xwe avêt ser derzika piştê, xar û gêj bû, xilmaş bû ket nav derya xewnên rast û derew, êla xwe anî bîra xwe, li nik bav û birayê xwe rûnişt, destê diya xwe ramûsa, jê re sûnd xwar ku ya gundî bêbextî pêre kir, Xelef di vê rewş û gengeşa sîberî de, diya Elî xwe bêperka avêt ber lingê wî, kire îske-îsk jê re da nasîn ku nema kare vê mijarê ji ber veşêre,Xelef bi tirs jê xwest da bibêje û ne tirse û jê re got :Hema xêr be? te ez



Institut kurde de Paris

veciniqandim, rabû diya Eli ta bi derziyê vekir û dûbare kir ku Sultanê ola islamê nikare Elo û Çinarê ji hev dûr bike, destê wan ji hev berde .

Xelefê gavan tev xurcilî, xwe biserhevde guvaşt, weke depekî rabû li qûn rûnişt, li dor xwe temaşe kir, ramanên bi qincir û madxelîn di serê wî de kirin cirîd, çehrê wî reş xeriqî, çavên wî weke du stêrên rijyayî, ronî dan, dûvre vemirîn, neçare bi dengekî melûl ji xanima xwe re got: Hey..hey kulekê min dizanîbû ev têkîlî û mervantiya te û jina Ibrahîm axa, ne ji bo Xwedê ye, wê me li kelem û diriyan biqelibîne, me di herx û kortalan de werke, wê bibe serêşan û sergêjek ji me re .

De binêr xatûnê? ji vê rojê de bi zimanê xwe karibe? seredana mala axê kêm bike, binêr kulekê bi dizî û zîrekî ser me û bin me bifiroşe, dûv re ez riya xwe nasdikim .

Ew pîreka gundî ya bêbextî li xalidê kurê Şeref axa kiribû, êşa zirav ew dawerivand ta ku bû hestî û çerm, û roja ket ber xirîna mirinê, ji çend kesên navûser re got, li wan mikurhat, ku wê bêbextî li Xalid kiribû, ji bo



Institut kurde de Paris

gunehê wî di stiwê wê de nemîne, her tişt beyan kir.

Ji wê rojê de diya Xalid xew neket çavên wê, bê hedan û yefş her çar kurêd xwe, weke çar gurêd dev bixwîn, berdan wê navçê wê berekê, qereçî û mitirb û baba derweşên wan deveran hemû xistin heledewê, soz dida ew kesê nûçeyên Xalidê penaber jê re bîne, cihê wî nasbike, wê xurcezîna wî tijî mecîdî û kîse bike .

Mihemed biçûkê bira ji kezeb şewatî xwe kir rengê parsekan, û serberjêr bû, li gundan digeriya ji şivanan ji gavanan dipirsî, ka kesekî xwînî? bêxwedî? nasnakin? .

Rojekê piştî nîvro çawa gihişt gundê Hewarê bi torfelaqî dît ku qîr û hewar, lêdan û girî, şewt û dixane, xuya ye gund dinav gosirmet û bêtarek mezin de ye, gundî ketine qaqa reş, kurê Ibrahîm axa bi qepera yê parsek girt, da ber şeqaman, û her jê re dibêje: Te kes bi rê de nedîtiye.? tu kî ye? tu weke Xelefê Gavan e? Mihemedê parsek matmayî bû, devê wî li hevket, gotinin kelevajî ji xwe berdan, û bi lez bê deng, kera xwe ajot mala yekî gundî .

Xwediyê malê yê dilkovan jê re got: Parseko xizano ma çima tu vê rojê hatiye vî gundê dinav halan û talanê de kes newêre serê xwe ji derê mala xwe derîne, ji xwe ûcaxan tu xistin bin baskên xwe, kurê axê tu bin dar nekir û kera te nekuşt, ma bêtara bi ser vî gundî de hatiye, gawir û Misqof nebînin, ev du şev û du roj kurêd Ibrahîm axa ev gundê reş û dirêj xistine nav waxûwelê û pepûkiyê, nebxêr û stwê wî bişke, Elî kurê Xelefê gavan Çinarê qîza axê revand kes nizane çûne ku, xwe avêtine tor û bextê kê, ma parseko Hecîlok, gerok, ev qas sal tu vê deverê serûbin dike, lê digere te bihistiye, kurê gavanekî keça axê revandiye? ma ev ne dawiya dinê ye? vêca wê Decalê ku bi riha xwe xakê diqelêşe û Yacûc û Macûc bidin dûv, wê dinê wêran bikin .

Mihemedê parsek jê re got: Raste gotina te bişekie be-lê amo ew gavan ji kîjan êlê bû? ji kîjan deverê bû? yê gundî bersiva wî da got: Bixwedê ev nêzî bîst salan hatibû vî gundî, kes nizane çi kes bû .

Qereçî bû? Mitirbû? xwînî bû? lê çaxa pîrekên gund kuleka jina wî şermezar dikirin, ewê digot şiwê min ji maqula ye, û

Institut kurde de Paris

dinav êla xwe de navê wî Xalid axa ye, Mihemedê parsek ev gotin bihîstin, qirçîn ji dilê wî hat, wê şevê bi rûşuştî ew gund peland û serad kir, ta ku tapkir teqzekir Xelefê gavan birayê wî ye, wê şevê xwe spart xewnên hişmendî û jihevderxistinê, gelek nexşe û rêçik anîn berhev, her û her li xwe vedigerand, ji xwe re digot: Bilî bajarê Amedê cih û war ji Xalid re nemane Amed bajarê xwîniyan û bêxwediya ye,ew dikare koça Xalid bilûsîne.

Navbera gundê Hewarê û Amedê çiyane, deşt in, çem in daristan in, her cûreyên teba û lawirên dirinde lê hebûn wê demê Dewleta Elî Osmanî qels û bêhêz bû, dever dibin siya keleş û dizan de bû, fermandarî ya şêx û axa bû, ewan Xelîfê islamê diparastin, yan Kurdan dikarîbûn bi hejikên darên beriwan leşkerê osmanî ji welêt derxin, Mihemed biçûkê bira, bê hêvî, bê ronahî, ketiye nav deşt û çiyan, li nik şivan û gavanan dihewire dinive, bi wan re dixwe, bi rêberiya wan li karwanê birayê xwe digere dişopîne .

Şevekê şivanekî dilê xwe jê re vekir, çîroka şoreşgêriya xwe, dabaşa malbata xwe jê re gotin: Çawa wî û hevalekî zana xwestin

Institut Kurde de Paris

qereqola leşker berebat bikin, deverê ji wan û stemkariya wan rizgar bikin, çawa axayê wê navçê li wan geriya ku wan bikuje, û şêx bixwe di mizgeftê de got: Ev xort Gawir in, xwîna wan helale, piştî wan bihist ku qulûziyê li wan dikin, ew reviyan, her yek bi cihekî de terqiya .

Mihemed jî dabaşa bîrayê xwe Xalid jê re got, çawa ku diya wî dibêje, Xalid ji bavê xwe re got: Ezê herim nik leşker û lîderên Horos peymanan bi wan re deynim, çekan ji wan bistînim, xortan hînî karbianîna çekan bikim, bi hesanî leşkerê Osmanî ji welêt derxim, xwe bikim melekê vê deverê, lê şêxê mezin ji bavê min re got: Wê ev kurê te lingê te bixe soleke teng, berê te bide qir kirinê, lê mixabin jinek bênamûs bêbextî li birayê min kir, bavê min û şêx Xalid dûrêlî kirin, ew penaber kirin .

Mihemed dilê xwe ji hevalê xwe re vekir, û çîroka xwe ji serî ta binî jê re got: Rabû şivanê şoreşgêr keriyê pez bire ber deriyê Xwedî, bi Mihemed re bû heval .

Bi dizî yê,bi parsê, bi keleşiyê, gihiştin Amedê dergehê Mêrdînê, her sibeh diketin kolanên Amedê çi karê heye dikirin û li



Institut kurde de Paris

Xalid axayê Zozanê jorî digeriyan her êvar lûsê wan xana. Haçî Fetah bû û çavên Hacî ziq mabûn bi dûv Mihemed de, bo zîrekiya wî û sincên wî yên nerm û kovan, ji xwe re digot: xwezî ev kurê min biya, yek caran Fetah beg Temo destbirayê Mihemed dîxîst tewla hespan, bin wan dimaland û keda wî diber mafê razanê de dibirî, lê mixabin rojekê dûpişkekî pêveda rebenê Temo lotneda mir, bi dîtina hevalê xwe Xalid şanebû .

Mihemed sewsî bû, her tişt li ber çavên wî reş bû, derd û kulan di serê wî de pêşbazî kirin, roj bi roj diçilmisî, histiran çavên wî newq kirin, diya xwe ji bîr kir, çîroka Xalid ji pencên ramanên wî riha bû reviya, ji ser gora Temo vedigeriya diket axurê hespên rêwiyan, her çiqasî Fetah beg li ber dilê wî diçû û dihat jê re digot: Ezê jinekê ji te re bînim ezê xanekê li dergehê Urfayê ji te re ava bikim, ewî xan û mal û jiyan di qozîkek tarî de dorpêç kirin, xewnên nexweş û bi kelem ew dîl kirin .

Rebenê Fetah beg û kulfetê xwe mabûn guhdarên Mihemedê delalî, ew derbasî malê kirin, xanima Fetah beg ji dil tê dawer dihat,

qîza spehî û nazdar pêre tenazî dikirin, hêdî hêdî xwîn bi çehrê wî ve hat, rehên xweşiyê û dilgirtinê xwe berdan dil û dêmên wî, rengê zozanê Şerefdînê xwe li lêv û eniyê, û hinarkên riwan veda .

Rojekê Fetah beg dirav dane Mihemed jê xwest ku here bazara pez berxekî baş û qelew û helal bikire, bîne bo rewanê destbirayê xwe Temo bike qurban .

Mihemed bi saryana sibehê re xwe berda sûka pezfiroşan ket nav canbazên Amedê, her yekî dixwest tepekê lê bike, ji lewra durvê wî biyane, lê Mihemed baş hînî tep û rîpên wan bibû, xwe li kale pîrekî girt jê re got: Min berxek qurbanê divê, ne bawî be, ne nexweş be, ne yê diziyê be, kalo li gotinên wî guhdarî kir, awirên xwe sûtin tûj kirin, li dêm û çavên wî nêrî, hêrz hatinê, miwên mijankên wî bûne pîj, weke ku ji xew vecinîqe, bi zarekî betwetî û devekî lapûrî jê pirsî: Birazî xuyaye tu ne ji bajêre? .

Ewî bersiv da: Lê amo ez şagirtiyê xana Hacî Fetah im, ewî ez şandime berxekî qurbanê, bo ser gora destbirayê xwe Temo serjêkim, neçare kalo bi giranî berxek pijirand jê re sûnd xwar: Bi serê kesê dûr û

Institut kurde de Paris

zilamê çê ev e daxwaza te, û bi destekî nîv şikestî dirav ji dest girtin, ew ji pêlavê ta qoçika serî dinav ramanan de pêça, Mihemed bi lez berx bir û pişta xwe da kalo ji ber awirên dijwar winda bû .

Xalid bê hiş û bîr vegeriya ew nizane çi kirî û çi firot! tayek sar û germ ew li hev pêça, ket nav nivînan, bû hube-huba wî, kulfet li dor civiyan, qîzan, jina Elî destê wî maçkirin diya Eli jê pirsî: Ka çi ye? çi nexweşi ye lê ew bû term, çavên wî xarbûn wêneyên bavê xwe, diya xwe, xuşk û her çar birayên xwe anîne ber tîrên ramanê xwe, ev ne Heso ye? ne Şero ye? ne Xelo ye? Mihemed pênc salî bû, durvê bavê min lê dixwarin bavê min tim digot: Ev ji pişta min e wê şûna min bigre .

Ewî bi hezaran wêne û nîşan û xalên bavê xwe bîr xwe anîn, dengê Mihemed biçûkê bira, reng û dêmên wî dixistin terazûyê, ji xwe re digot: Zarê wî Zozanî bû, lê xana Fetah çima? gewdê wî û lebat wî, pişta wî xweş pesnên Şeref axa ber çav dikirin, ma gelo birayê wî Temo kî ye ..? çima got: Ez şagirtiyê Hecî Fetah im..? dibe xocayê Xidir bû mizgînî min re anî ku hinek ji malbatê



Institut kurde de Paris

nêzîk bûne, yan reşkê şevê bû xwe kir temtêla birayê min, bêrîka xwe peland, diravên buhayê berx derxistin lepe-lep bi devê wî diket, tewş û mewş dipeyivî, rewşa ber mirinê dida nasîn .

Diya Elî, xanima Eli Cînar hemû li oda Xalid civiya ne, cihê serê wî xweşdikin, lake-lak û lûbe-lûbê li ber dikin, li ber digerin qena ji wan re bêje, çi pêre çêbûye? çi bi serê wî hatiye? çima nahêle herin Xorênê Nijdar bênin, hinga Elî û xanima xwe dest û lingên wî maç kirin piştî du rojan ewî çîroka xwe û berxê qurbanê ta bi derziyê vekir, dilê xwe yê xemgîn ji wan re vekir, diya Elî dîlê wî xweşkir ku ji nuha û ta êvarê, saloxên vî kurî jê re bîne, vê kulê ji hinav û cergên wî derîne, diya Elî kincên bi nexşên destan xemilandî, cilên kevnar yên malmezinan, (erê hinekî peritîbûn, lê hîn cewher didan), wergirtin û kete kolanên Amedê xana Hacî Fetah tu li ku ye?.

Hecî Fetah bîxwe kefte bibû, boz-boze bibû, dinav salan de çiwî bu, kurdûnde bû, du keçên wî hebûn, yek dabû kurê başbazirganekî ji Madenê û ya din bi heft dilan dilketibû şagirtiyê xanê, Mihemed

Institut kurde de Paris

birayê Temo, dê û bavên wê bixwe giyanê wan di nav çavên Mihemed de bû, hinga xwîn şêrîn bû, ser nerm bû, can sivik bû, tore û sincên baş ji çehrê wî dinisilîn, mêrxas bû, ji roja hatiye vê xanê, yek diz û canbaz nehatiye serdestî li Hacî nekiriye, ji xwe diya Qeşemê dibeje: Asîman qelişiye û xwedê Mihemed têre avêtiye ji qîza min re şandiye? ewê digot: Mihemed dûndê me ye, ev xan û mal hemû jê re ne. Mihemed piştî vê dana xwedê, û hesanî û xweşiya ku ketibû yê pirsgirêka birayê xwe Xalidê winda, yê ku ji bo wî terqiya ye hemû ji bîr çû yî bûn.

Çawa diya Elî derbasî xanê bû, himber Hacî rawestiya, bi dengekî melûl û nizm, xêrhatin tê da, lê diya Elî hinekî jê sawgirt ji qilavet û gewdê wî, ji awirên wî yên weke awirên pilingekî qore-pîr, tîrêjên çavan dinav pûrta ebriwan de diçirisandin, çaxa diya Elî ji Hacî pirsî qudûmên wê sist bûn, gotinên wê ji ber hev derketin, xwe bihev negirtin, mixabin Hacî guhnedayê, lê gotina ku ew şiyar kir gava pîrê got: Xortek heye li vê xanê? pêre-pêre pîrê dengê xwe hilda û bi zelalî ji Hacî re got: Beriya du rojan, ewî xortî berxek ji şiwê min kirî, û hinek diravên

wî bi serde çûne, zilamê min hinga oldar e, dixwaze ku ew xort were nik wî malê xwe bidestê xwe bigre, zilamê min nexweş e anuha dimre yan sibe? ji roja berx firotiye ketiye, serê xwe ranekîriye, çavên xwe venekirine, tenê dike hewar û gazî dixwaze, em xortê berxê qurbanê bînin mafê xwe bistîne, qena bê guneh here dîwana Xwedê, Hacî ez ling û destên te maçkim twê vî gunehî vê ziyanê ji stiwê şiwê min derxî?

Hacî Fetah baş guhdarî kir, kete daristanên ramanan ji xwe pirsî: Ma gelo ev çi ye? ev pîra sihr e? ji bo çi hatiye? kê ew şandiye, Mihemed tu ziyan nekiribin ?!

Hacî xwest bi xurtî pîrê bi qewirî ne, lê neçare xwe ji tika û lavan riha nekir, bang kir Mihmed û jê re got: Kurê min vê pîrê bibe aliyê malê û li wir bi hev re bigihên çarayekê, di nêrîna min de ev pîrek ne derewîn e û rengê malmezina pê dikeve, Mihemed bê dudilî, bê lam û cîm, serê xwe danî û ket ser riya mala Qeşemê, diya Elî bi dûv de kulkulî, diya Elî kuleka zîrek û çavnas, ji paş ve baş bala xwe da gewde û birêketina Mihemed, dûv re jê re gor: Kurê min ne lezîne ez nikarim vê lezê bikim, ewî

Institut kurde de Paris

bersiva wê da: Pîrê mal va ye dused gavek e, lê pîrê bi kotekî xwe gihand tengala wî, û pêve bû dirdirk jê re got: Kurê min ez dizanim tu ne lawê Hacî Fetah e, û durvê te xuyaye lê ev Temo kî bû yê ku te berx jê re kir qurban? Mihemed bersiva wê da û got: Anuha doza te çiy e? tu pîra sihra ye hatiye xerabiyê bike, eger ne ji bo..? û berdewam nekir ez bi te re nedihatim aliyê malê, dûv re Temo destbirayê min bû û miriye te çi jê divê? piştî kulekê naskir Temo kî bû, ewê hiş û raman û nêrîn hemû xistin gepcîkî û weke pehlewan kulekê lê zîvirî bikêf jê re got: Çavê xwe vek ez ne sihrekim ez xanima Xalid axayê Zozanê Şerefdînê me, lê mixabin dem û dewran li me geriya ne em hatine nav şeqal û beqalan, ma şiwê min Xalid yê ku berxekî ji bo qurbanê bifiroşe? bav û kalêd wî bi hezaran bi keriyan pezê wan heye? paşê ji Xwedê bi tirse şiwê min ev çend rojin di nav nivîna de ye bê pergale, bi şaşî dipeyive kefrûzî bûye, bi hisreta dîtina te ye? ew dibêje: Birayekî min hebû temenê wî pênc sal bûn, çaxa min zozanê Şerefdînê berda ez hatim bûm gavanê Hewarê .

Mihemed ev gotin û dabaş bihîstin, kabokên wî fisiyan bê hêz bû, ber çavên wî zer bû, bê perka xwe spart dîwarekî, xar bû, çavên wî zîz bûn, çawa hinekî ket gomanan û şiyar bû ji pîrê pirsî.? ka Xalid? tu derewa dikî? tu ne jina Xalid e tu pîra sihr e?

Kuleka bihiş û raman her tişt dît û naskir, ewê bi toreyî baweriya wî anî, gelek bûyer û çîrokên birayê wî jê re gotin, navê diya wî, bavê wî û xuşkên wî, dabaşa gavantiya wî, dabaşa derketina wan ji gundê Hewarê, hemu di çavgirtînekê de gotin.

Carek din Mihemed biçûkê bira, xwêdanekê hûr-hûr li ser hinarkên riwê wî çirisand, gêj bû, sist bû lê xwe ji dîwar berneda û nema gavek avêt pêş, ji dest xwe çû, tenê ewî xwest destê pîrê ramûse, lê gewdê wî pîre kar nebû, rabû tika ji pîrê kirin ku wî nexapîne rast lê mikur bê û jê re got: Xalid axa birayê min e eger tu ne cin e yan pîr Hevok e ezê xwe bi qurbana te bikim, anuha tu çi dixwazî ezê ji te re bînim, zêr bin, kinc û cilên qeşengî bin pîra diya Elî bersiva wî da: Mihemed kurê min ez jin bira te me, de bilez em herin nik birayê te, rewşa wî xerabe, keça Ibrahîm axa û biraziyê te Elî

ji ber serê wî ranabin, ma kurê min qey ezê te bixum, ma tu li Qeşemê digere? yan li birayê xwe Xalid? netirse da em herin malê, sibe ezê Qeşemê ji te re bixwazim, Mihemed xwe tev xurciland, xwe bihêz û xurt kir, damarên mêraniyê li eniya wî rabûn, xwe avêt destê jinbira xwe maçkir, Qeşemê û xana Hacî Fetah ji bîr kirin da tihêla kulekê, li pişt xwe hiştin, li ber derê malê diya Elî sê dengan lîland, dengê wê weke dengê keçek gihiştî lihevgeryayî ku xêliya keça amê xwe be zimîn bi qozîk û kolanên taxê xist bavê Elî ji nav nivîna çambû, ewî bi xwe nizanîbû çawa himber birayê xwe rawestî, nala gurekî pîr-pîre ku çêlîka xwe himbêz bike .

Li mala bavê Elî bû şahî û dîlan, lê mixabin li mala Hacî bû pevçûn û girî û şîn, xanima Hacî pere rijandin dane pêxwasan dane delêlyan, ewan çare nedîtin, biser mala kalê pezfiroş venebûn.

Sibeha înê koma Xalid axayê Zozanê Şerefdînê girt ser Xana Hacî Fetah, gelekî bihev re kêfxweş û şadîbûn, diya Qeşemê xwarinek bajarî ji wan re çêkir, Hacî Fetah çîroka Xelefê gavan bihîst, ya Mihemed bihîst, ewî ciwamêrî ji wan re beyankir ku

Institut kurde de Paris

ew kurdûnde ye, hema her xan û malên min wê ji Mihemed û Qeşemê re bin, rabû Xalid soza mêrê çê ji wan re da, ku here Zozanê Şerefdînê erêniya diya xwe bistîne, û biryar dan ku paşerojan Elî û Mihemed li Amedê bijîn, ji Hoz û Êlên Zozana re bibin keleh .

Karwanê Xalid û Mihemed û diya Eli kar bû, birêket ne şev bi wan şeve bû, ne roj biwan roj bûn, dixwestin xwe bigihînin diya xwe, ya ku ew nizanin ne saxe ne miriye, Xalidê xwedî azmûn û serbor, bi diravan bi nermî û hişmendî xwe gihand sînorê Êlê, xwe gihand Xaka bav û kalan, Xalid çend kêlîkan çavên xwe guvaştin û vekirin dîmenên welêt, newal û çiya û daristan, çem û cobar qûnaxên rengîn bilind xuya dikirin, Qesra Şeref axa weke avayên Amedê spehî û mezin xuyadikir xan û malên gundiyan fireh bibûn, welatê Şerefdînê spehî û qeşeng dihat berçav, sra bayê wî li dêmên Xalid xist, firnikên wî xulxulandin, bînek xweş pêre-pêre ket mejiyê wî, dinav xwe û hişê xwe de digot: Her tişt hatiye guhertin, celebên latan, bîna gul û kulîlkan deng û awazên çivîk û tilûran, çehrê mirovan tevgera şivan û gavanan .

Institut kurde de Paris

Karwanê Xalid derbasî gastîna Şeref axa bû, xire pişek-mir-mirek, çaw-çawek kete guhê her kesê malê, deng li hev vegeriya, qîzan û xortan û sîpan, kirin wîz-wîz, navê Mihemed dinav pêlên dengînê de dihat gotin, Xatûna Şerf axa pêjna vê tevgerê kir, xwe ji qata jorî berda, bi kotekî xwe gihand nav komê, Xalid çav li diya xwe ket hêrzan û perqîna girî û kelgermiyê ew girtin, bê hiş xwe avêt himbêza diya bendewar, gava diya wî navê wî bilind kir, koma keç û xortan û bûkan Mihemed berdan, çûn li Xalid temaşe bikin xatûna Şerefdînê piştî bînekê û berya kela dilê xwe hênik bike, ji Xalid re got: Kurê min va ye min piştî mirina bavê te meznahiya êlê ji te re parast min armanca bavê te bicih kir, û Xatûna êlê dinav destê Xalid beg de xiliya bi dilovaniya Xwedê şabû.

Nûceyên vegera Xalidê winda û mirina diya wî ketin guhê lat û zinaran, ketin guhê rêwiyan û şivan û gavanan, hawêr paytexta Zozanê Şerefdînê ji swaran û peyadan xemilî, êl û malbatên deverê hemû biserde qûriyan, bê yefş û hedan Nişmiyê xatûn di nav pîrekan de kar û barê xatûniyê û

Institut kurde de Paris

fermandariyê dikir, ewê xwe ji Mihemed dûr nedikir, her û her pêre rêçik û pîlan datanîn dawî gihiştin çareyekê, ku selefek swar, bi melayekî, û zanayekî êlê, û Mihemed herin ser cila Ibrahîm axa dilê wî xweş bikin, qelenê wî bidinê dûv re herin Amedê Qeşemê ji Mihemed re bi xwazin.

Xalid begê mîrê Zozana hevpeyvînê bi aqilmendên bavê xwe re danîn bi tebayê biryar dan ku Mihemed û Elî li Amedê bicih û war bibin, bibin qûnax û keleh ji êla giran re.

Li Hewarê sê rojan agirê Ibrahîm axa venemirî, gundiyan ji hev re digotin: Me dizanî bû Xelefê gavan reng û temtêla mal mezina lê dixwe, Salîha xatûn û kurê xwe ketin nav karwanê Mihemed, xatûna Ibrahîm axa kevrûzî bibû bo dîtina keça xwe Çinarê .

Li Amedê Fetah begê devê xiznên zîv û zêr vekirin, Qeşemê û Mihemed li hev markirin, xan û qûnax ji wan re kirin, mizgeftek ava kir, melayê Şerefdînê kire berpirsiyarê wê, herdû kur aman, bazirganî û pêwendî xistin navbera Amedê û Zozanan, di demek kurt de bûn başbazirgan, li Amedê binav û deng bûn, bi sedan xortên qehreman

Institut kurde de Paris

û rêber û serok karwanan xwe li dor wan danhev, ewan bi qenciyê û danê û sincên bilind, xwe xistin rêza navdarên bajêr, Mihemed beg qubek li ser tirba destbirayê xwe Temo avakir, her pêncşem li ser gora Temo dibû izomet, sêwî û bawî, kor û seqet li wir diciviyan, hemiwan destê xwe bal bi asîmana de bilind dikirin, lava û tika dikirin, bo Xwedê Mihemed beg mezin bike, Eli bi zîrektî û zanebûn fermandarên osmanî hogirî xwe kirin, ewan ciwamêran danî bûn ber çavê xwe ku çend bazirganên destikên osmanî, yên ku herdem qulûzî û xinizî ji wan re dikirin, dixwestin wan ji qurm de rakin, Amedê ji wan rizgar bikin, lê mixabin serok û xuyayên bajêr çav reşî avêtin Mihemed û Elî bi alîkariya çetan û pêxwasan çend carî xwestin wan bikujin, û gava tu çiq biwan nekirin, xwe gihandin dergehê Sultan bi serok şalyarê wî dan nasîn, ku ev kesên Zozanî hevalê Horos in, ev qas mal ji cem Horos ji wan re hatiye, ew dixwazin vî welatî bixin bin destê Horos. Demek derbas bû ta ku dijminên Mihemed û Elî barê wan li nik Sultan giran kirin .

Institut kurde de Paris

Dawî Sultan Fermanek derxist ew penaber kirin devera derdora Enqerê, û ta çend salan li wê navçê ji wan re digotin ew binavdikirin Kurd oglu .

Institut kurde de Paris

# SERECEM

1-Nivîskarê mezin .......................... 13
2-Kesk û sor .......................... 19
3-Kurê bizinê .......................... 23
4-Çelebiyê .......................... 29
5-Çîroka beg û axan .......................... 39
6-Beranê ber kêrê .......................... 48
7-Gir Newas .......................... 59
8-Yewel ya kurdî .......................... 65
9-Baba Derwêş .......................... 71
10-Xurcika cihû .......................... 82
11-Xelefê gavan .......................... 89

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



## *Kurt-jiyana nivîskar*

-Di sala 1938an de li gundê (Sada) navçeya Qamişlo ji dayika xwe re bûme..

-Xwendina xwe ya seretî ta bi bekelorya min li gundê Doda û bajarê Qamişlo qedand, paşre ez çûm parêzgeha Hisiçe û li wir xwendina (mamostayê) tewa kir, pişt re min du salan li zanîngeha Şamê zimanê Erebî xwend .

- Dûra min bîst salan di warê mamostayiyê de li dibistanên herêmê karkir .
- Û di nav van salên çûyî de, min xwe bi çand û toreyê, çi bi zimanê Erebî û çi zimanê Kurdî mijûl dikir, ta vê dawiyê min giringiya nivîsandinê bi zimanê bav û kalan pejirand. û dest bi nivîsandina hin pertûkan kir..
- Di sala 1995 min berevokek bi navnîşana (Gula civatê) belavkir. Pey re pertûkek bi navê (Çîvanok û pêkenok) jî weşand û li paşerojan çend pirojeyên minî toreyî hene bendewarê çapê ne .

*Abbas Ismaîl*

Institut kurde de Paris